Fîrozeyê Tûfegul

Fîrozeyê Tûfegul jinek cengawer a kurdên Xorasanê ye ku mil bi milê mêrên ji eşîra Celalî di çeperên şer de û li dijî dijmin şer dikir. Ew li pey bû ku bajarê Fîroze paş ve bigire û tola xwîna gelê xwe ku hatibû rijandin, werbigire... *Zehra Mohammedzadeh/ R.2*

Edebiyat û prestîj

Eger em bi şêweya navlêkirina Pascale Casanova bibêjin, di Komara Wêjeya Cîhanê de mesela prestîjê di çarçoveya endustriya çandî de bi awayekî gelemperî çareser bûye û kevir û kuçan cihên xwe girtine. Reytînga nivîskar, weşanxane... *Samî Hêzil / R.5*

Dayê ma ez hov bûm?

Piştî forûmeke li Parka Cîhangîrê, em ji bo Medenî Yildirimê ku li Licê hatibû kuştin, bi kevnekuratorên bîenalê û hunermendên tirk re mil bi mil meşiyabûn, ev çalakî di henga meşê de jî bi min xerîb hatibû, ez bi şik bûm, nediket bin kûmê min... *Şener Ozmen / R.11*

Rojnameya Heftane

xwebûn

16-22 Adar 2020

Hejmar: 13

Buha: 4 TL

www.xwebun.org

rojname@xwebun.org

Sembol û sergovend

21'ê Adarê yanî cejna Newrozê sersala kurdan e. Ev cejn ji bo kurdan bi çend sedeman gelek girîng e û cejna kurdan a sereke ye. Li çar parçeyên Kurdistanê, li her bajarê Kurdistanê gelê kurd bi hezaran derdikevin qadan û bi hestên neteweyî, bi coş Newrozê pîroz dikin. Jinên kurd agirê Newrozê geş dikin. Agirek wisa vêxistine ku ne tenê li Kurdistanê li hemû cîhanê xuya dike... *Aysel Tabak / RÛPEL - 2*

Di şer de qonaxeke nû

Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi hemû lez û beza xwe ve didome. Bêguman zilhêz, ango hêzên hegemonîk jî tê de hemû dewlet û hêz bi awayekî tev li vî şerî bûne. Xisleta vî şerî pir-reng e. Ango ne xwedî xisleteke 'reş-spî' ye. Di navberê de reng û dengên gewr jî hene. Bi gotineke dî tifaq, lihevkirin, enî û hevpeyman rojane tên guhertin. Şer bûye şerê dîplomasî, enformasyon, îstîxbarat û teknîkê... *Mem Avba / RÛPEL - 7*

Rûsya di kemînê de ye

Rûsya di halê heyî de niha li herêmê li gor peyman û sozên hatine dayîn emelên dewleta tirk dişopîne. Rûsya niha di kemînê de ye û li bendê ye ku tirk sozên ku dane pêk neynin. Ger sozên dane pêk neyên, wê demê dê dewletên rojavayî nikaribin Erdogan û Tirkiyeyê ji êrîşên Rûsyayê biparizin. Lewma di hevdîtina li Moskovê de Rûsyayê bombeyek xistiye paşila Erdogan. Niha derdê... *Felemez Ulug - R.6*

Vîrusê Newroz betal kir

Vîrusa koronayê ku li bajarê Wuhan ê Çînê derket holê li seranserê cîhanê berbelav dibe û her roj bi sedan kes dimirin. Têkildarî vîrusê agahiyên cuda tên dayîn û cara ewil rayedarên dewleta tirk ragihandin ku 5 kes bi vîrusa koronayê ketine. Li bakurê Kurdistanê ji ber vîrusê pîrozbahiyên girseyî yên Newrozê hatin betalkirin...

RÛPEL - 3

Wuhan kuxiya, hemû cîhan bi zekemê ket... Ramazan Tûnç /R.6

Birîna hê jî xwîn jê tê; Helebçe

Bi qasî xak û dîrokeke bi berhem ewqasî jî bi êş û kul e Kurdistan. Bi qasî gelê ku leheng û mêrxas e, ewqasî bi birîn û keder e. Jina kurd çiqasî xweragir û bi qudret e, ewqasî li ser sînga wê ji sungî û mîxên xayîn û nemerdane tije birîn, hesret û keser e. Em xwedî dîrokeke qedîm û heqîqeteke wisan in, hema bêje tu rojek nîn e ku xwedî wate, pîrozî û êş nebe. Ji bo vê ye ku dijminên gelê kurd ên xwînxwar tim ji bo li xwîna kurdan bimijin, bi devxwîn û çavsorî êrîş dikin, qetil dikin û tune dikin. Em weke her salê îsal jî hatin wê rojê... Ew roj 16'ê Adara 1988'an Helebçe ango bi navê xwe yê din 'Enfal' e. Enfal dîrokeke ku tu carî wê neyê jibîrkirin û tim birînek be li ser bedena dayika me Kurdistanê... *Harûn Evîndar / R - 8*



Ziman û ruhê wergerê

Me gahiyên xwe yên derheqê edebiyat, zanîn, teknîk û teoeriyê de ji zimanekî din hildane. Em van agahiyan pêşî di hişê xwe de werdigerînin zimanê xwe û di heman demê de werdigerînin ser ruhê xwe jî... *RÛPEL - 11*

ANTRPARANTEZ

Wendoxê erjayeyî yê rîpelê kirmanckî yê Xwebûnî merheba. Goreyê mi ra, nuştene seba ma mesulîyet o. Aye ra gama ke nê rojnameyî ra embazan mi reyde têkilî rona û waşt ke ez ge-ge bînusa, mi dest de qebul kerd. La seke mi înan ra zî va hetanî ke îmkan bibo û wext estbo ez wazena aşme ra reyê nê goşeyî binusa. Eke şîma pers bikê û vajê "Baş o, ma ti do tede çî binusî?" Ez eşkena cewabê şima wina bida: Çîyê/qewimîyayîşê ke kurdan... *Pêşar Bextewer - R.9*

'Strana bi dil hîs nekim ez ê nebêjim'

Min sozek daye xwe û guhdarên xwe; strana bi dil û giyan hîs nekim ez ê nebêjim. Muzîk bexçeyê giyanê min e û dixwazim wî bexçeyî her paqij bihêlim. Lewma bi hezkirinek mezin bi muzîkê re mijûl dibim. Kevirê heps û tirba xwe wisa dixemilînim....

Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4

Sembol û sergovendên Newrozê

Aysel Tabak

21’ê Adarê yanî cejna Newrozê sersala kurdan e. Ev cejn ji bo kurdan bi çend sedeman gelek girîng e û cejna kurdan a sereke ye. Li çar parçeyên Kurdistanê, li her bajarê Kurdistanê gelê kurd bi hezaran derdikevin qadan û bi hestên netewî, bi coş Newrozê pîroz dikin.

Lê em dizanin ku Newroz ji bo kurdan tenê sersaleke gelêrî nîn e. Roja vejînê, roja serhildanê ye. Ev maneyên dawîn bi destana Kawa ve tê girêdan û berxwedana ku îro kurd didin girêdayî berxwedana Kawa yê ku li hember Dehaqê zalim serî hildaye, tê kirin. Wek ku tê zanîn li gor efsaneyê kurd di bin zilm û zordariya Dehaqê zalim ê ku nedihişt bihar bê welatê kurdan de jiyabûn. Li gor efsaneyê her roj du ciwanên kurd ji aliyê aşvanên Dehaq ve dihatin kuştin û mejiyê van ciwanan didan marên ku li ser milên dehaq şîn hatibû. Du aşvanên xêrxwaz ji bo xelaskirina ciwanan li qesra Dehaq dest bi kar dikin. Her roj ji her du ciwanan yekî xelas dikin û dibin serê çiyayekî, di şikeftekê de vedişêrin. Bi demê re hejmara van ciwanan digihêje 200 ciwanan. Kawayê Hesinkar van ciwanan bo şer-şoreşê perwerde dike û 21’ê Adarê roja Newrozê, bi hêzên xwe yên serhildêr ku ji van 200 ciwanên kurd pêk dihat, serî hildane û Dehaqî kuştine. Agahiya serkeftinê bi vêxistana agirek mezin ê li ser çiyê ragihandine gel. Gel bi vî agirî pê dihesin ku zalim Dehaq têk çûye û dest bi pîrozbahiyê dikin. Li gor efsaneyê destpêka cejna Newrozê ji bo kurdan ev roj e. Tê gotin ku bajarê Akreyê bajarê Kawa ye. Lewma li Başûr pîrozbahiyên herî mezin lê pêk tên.

Jin û Newroz

Di pîrozbahiyên Newrozê de, di dîmenên herê balkêş û xweş de, jin bi cil û bergên xwe yê rengoreng bi tililiyên xwe, bi rûyên xwe yên bi hêvî derdikevin pêş. Li ser govendên ku li dora agirê pîroz tê girtin jin hene. Jinên kurd sembola Newrozê ne. Li çar parçeyên Kurdistanê pêşengiya pîrozbahiyan dikin.

Wek ku me got, Newroz ji bo kurdan li aliyek mizgîniya biharê, li aliyê din jî roja berxwedan û serhildanê ye. Destpêka sedsala bîst û yekan bo kurdan bû salên berxwedanê. Di berxwedana kurdan de jin erkek gelek girîng girtiye. Êdî hemû cîhan dizane ku jinên kurd di her qadê de pêşengiya gelê xwe dikin. Nav û dengên şervanên jinên kurd bi berxwedana wan a destanî li hemû cîhanê belav bû.

Bi rastî jî van salên dawî Dehaqên ku li serê kurdan bûne bela ne yek in. Li aliyek hovên wek DAIŞ’ê êrîşî kurdan kirin, li aliyek dewletên ku axa kurdan dagir kiriye êrîş dikin. Jinên kurd berevajiyê jinên neteweyên Rojhilata Navîn, li mala xwe rûneniştin an jî ji êrîşan nereviyan, wek mêrên kurdan jinan jî çek hildan û ji bo parastina axa xwe şer kirin. Rast e di destana Kawayî de 200 şervanên ku bi Kawa re li dijî Dehaq şer dikin mêr in. Lê ez bawer im ji ber ku dîrok bi çavên mêran hatiye nivîsîn, an honandin rola jinan di vir de naxwiyê. Aşkera ye ku di piraniya şer û berxwedanên kurdan de cî girtine. Helbet ev efsane ye lê bi hezaran sal in ku dîrok bi hişmendiyeke mêrane hatiye honandin. Ne tenê di dîroka kurdan de bi gelemperî di dîroka cîhanê de jin wenda bûne. Mixabin nexweşiya qeydkirina dîrokê ya bi perspektîfa mêran pirsgirikeke navneteweyî ye. Ji ber vê jî şopandina rola jinan a di dîrokî de zehmet e.

Lê em îro bi çavên xwe şahidên berxwedana bi hezaran Kawayên jin dibin. Jinên kurd li çar parçeyên Kurdistanê li hember Dehaqan şer dikin û li ber xwe didin. Axa xwe diparêzin. Di her astên berxwedanê de erkên girîng digirin ser xwe. Her çiqas di nav şerek zor giran de jî bin, em wan di hemû dîmenan de bi kenek germ û bi nêrînên tijî bihêvî dibînin. Kawayên jin hêviya gelê kurd xurt dikin, agirê Newrozê geş dikin. Agirek wisa vêxistine ku ne tenê li Kurdistanê li hemû cîhanê xuya dike. Dê ew agir bibe mizgîniya têkçûna Dehaqan û azadiya gelê kurd.

Bi hêviya rojên azad Newroz pîroz be!

Di pîrozbahiyên Newrozê de, di dîmenên herî balkêş û xweş de, jin bi cil û bergên xwe yê rengoreng bi tililiyên xwe, bi rûyên xwe yên bihêvî derdikevin pêş. Li serê govendên ku li dora agirê pîroz tê girtin jin hene

Zehra Mohammedzadeh

Jineke cengawer; Fîrozeyê Tûfegul

Di her qirn û serdemekê de bi awayekî heqîqeta dîrokî ya kurd, qehremanî û têkoşîna wî ya hatî nixumandin, kariye bê pênase û zelal kirin. Lê belê rastiya jinê ya dîrokî di nav vê heqîqetê de zêde êşare pê nehatiye kirin, dem bi dem -zanebûn an jî bi nezanî- jinedîtîve hatine û nehatiye xwestin mija li ser vê rastiyê bê rakirin. Ji ber ku dema em dîroka kurd, civak û rewşa wî ya siyasî dinêrin hema bêje di her pêvajoyekê de, di serhildan û berxwedana kurd de jinê jî mohra xwe li pêvajoyekê daye lê qala wê, rol û têkoşîna wê zêde nehatiye kirin. Wisa be em ê heqîqeta jinê ya ku nehatiye pênasekirin, jinûve binirxînin.

Rojhilatê Kurdistanê xwedî erdnîgariyeke berfireh û dewlemend e. Dewlemendiyek ku bûye parzonka çandeke bi bereket a navenda wê jin e. Xasma Xorasan ku ji ber vê dewlemendiyê bûye navgîna şer û talana dagirkeran. Helbet qebîleyên kurd ên li Xorasanê ne tenê ji hêla çandî ve, belku ji hêla dîrokî ve jî dewlemend in. Her bihostek axa wê bi çîrok, destan û gotegotên qehremaniyên vî gelê qedîm ku li dijî desthilatdaran serî rakirine, bar kiriye. Ji bo wê, em ê vê carê jî mija li ser rastiya jinê bidin alî û dest biavêjin heqîqeta qehremaniya jinê.

Dibe we serhildana Serdar Êwez Xanê Celalî bihîstibe. Yek ji pêşengê qebîleya Zeferanloya bakurê Xorasanê ku di sala 1890’î de, li gundê Fîroze (ku niha ser bi Azerbaycanê ve ye), li dijî şahê wê demê û dagirkeriya rûsan dest bi raperînê dike. Helbet di wê serhildanê de bi qasî Êwez Xan, nav û dengê Tûfegulê jî heye. Ew beriya wê nêzî 138 salan li herêma Şîrwan a Xorasanê dijiya. Di encama peymanekê de Şah Nasredîn Qaçar gundê Fîroze dewrê hêzên biyanî dike lê wan nekarî dest ji axa xwe berdin û dest bi raperîneke mezin dikin. Jixwe welat bi tirkmenan re di nav şer de bû û Şah nekarî wan bi axa Îranê re girê bide. Rûsan ji firsendê feyde girt û bi siyaseta ku bi rê ve dibirin Şahê Îranê bi “Peymana Axal” a di sala 1893’yan de gundê Fîroze ku kurd lê diman, dîsa beşek mezin ji axa Xezer û bakur, bakurê rojilatê welat radestî rûsan dike. Armanc ji vê yekê bihêzkirina hikûmeta navendî bû. Bêguman li beşek mezin ji vê axê jî kurd diman. Serdar Êwez Xanê Celalî, xanê vê herêmê bû. Li gundê Fîroze kurdên kurmanc ên Selehşor ku ji qebîleya Celalî bûn, diman. Kurdên herêmê ji vê siyaseta Şah Nasredîn bi xof bûn û bi tu awayî li gel vê yekê nebûn ku dest ji axa xwe berdin.

Wek her carê wê kurdên herêmê bûbûna qurbaniyên siyaseta Şahê Îranê û rûsan, ji wan bixwestina axa xwe terk bikin û berê xwe bidin bakurê Xorasanê. Jin û zilamên dilêr ên Fîroze biryar didin li dijî dagirkeriya rûsan serî rakin. Ji bo wê jî di pêşengiya Êwez Xan û Tûfegulê de dest bi raperînê dikin. Şer û pevçûn mezin dibe, gelek cengawer tên qetilkirin û deşt û gelî bi lehiya xwîna van jin û zilaman tê şuştin. Lê jina wêrek, hevrê û hevsera Êwez Xan, têkoşera Fîrozeyê Tûfegul wê piştî kuştina hevserê xwe berpirsyariya birêvebirina gelê Fîroze bigirtina ser xwe û dest bi têkoşînê bikirina.

Tûfegul jinek cengawer a kurdê Xorasanê ye ku piştî kuştina hevserê xwe, rêberê ciwan ê kurmancan di têkoşîna li dijî rûsan û polîtîkayên Şah de (bûyera ku di navbera salên 1327-1335’an de rû dide) li ber xwe dide. Tûfegul jinek bû ku mil bi milê mêrên ji eşîra Celalî li dijî dijmin şer dikir. Ew li pey bû ku bajarê Fîroze paşve bigire û tola xwîna gelê xwe ku hatibû rijandin, werbigire.

Ger heqîqeta berxwedaniya jina kurd di şexsê Tûfegulê de xwestibe jinedîtî ve bê dîtin jî lê li her bihostek axa welat hîna dengê têkoşîna wan jinan olan dide. Hîna dengek enderûn ên van jinên bênav li deşt û newalên Fîroze deng vedide. Bi dehan jinên wek Tûfegulê ku îro navê wan nayê zanîn… Dengê van qehremanan ku bi her wezîna bayê re careke din dengê wan di guhê me de heqîqetekê bi zimezimê dixîne.

Helbet pir kêm tişt der barê wê de tên zanîn û bi taybetî dema ku em dibînin piştî hevserê xwe Êwez Xan berpirsyariya eşîrê digire ser xwe, eşîrê birêxistin dike û birêve dibe. Çawa çêdibe jinek wiha bi bandor evqas kêm qala wê tê kirin? Ev û gelek pirsên din ku hewceye em bikin hene.

Ji bo wê, kêm be jî her agahiyek der barê wê de girîng û hewceye ku em bi baldarî li ser rawestin. Li gor agahiyekê Tûfegul di encama şerekî de dîl dikeve û tê darizandin. Ew dû re sirgûnê Sîbiryayê tê kirin. Di rojên dawî yên temenê xwe de, bi evîna axa xwe, ew dîsa tê vegerandin û piştî ku dimire, cenazeyê wê dibin Fîrozeyê û li wir vedişêrin.

Helebçe

Mizgîn Ronak

Pirs ne mêvan in êdî
mazûvan in
li ser kursiyên rûniştinê
li ber şibakan
li tembûrê dixin
hişê te dinexşînin pirs
wek nazbalîfan
lêv badidin li bersivan
bers ditirsin
di tenêtiya nebesbûnê de
pirs êdî ne mêvan in mazûvan in
li ser qoltoxan rûniştî ne
li kemanê dixin
pirs her tiştî dikin pirs êdî
bersiv guneh in
bersiv belengaz
bersiv neman
pirs xwediyên malê ne êdî (belkî tu welat nîn î welato/kî dizane tu kî yî, em kî?)
Pirs êdî mazûvan in bera bersivan didin
paceyên ronî vedikin
biharê tînin hundir
li bîra me
rojên ronak...
Bersiv êdî ne bersiv in
pirs her tişt in (belkî tu, tiştek me nîn î welato/kes nizane tu çi yî?)

Helbestek ji helbestên min ên dawîn wiha dibêje bo pirsan. Ger pirs wiha ‘xwedî mal’ bin azadî nêzîk e. Lew tişta ku mala dewletan xera dike pirs in û hemî şoreş, bi pirsan dest pê dikin. Ji bo ku pirs, bersivên heyî betal û deşîfre dike jî zehf girîng e. Lew tu hew dibînî ku wayê bersivên ku heta niha têra te dikirin êdî têr nakin û tew ne bersiv in jî!

Mesela dema em ji pergalên serdest re bihêlin wê me mehkûmê bêpirsyariyê/nepirsyariyê bikin an jî sedsalan bi bersivek kartû (beyat) bidin derbaskirin. Lê niha vê adarê, bila pirsên me ji bo Helebçeyê bin: Helebçeya ku wek destegulek şikestî, di paşila me ya kuştî de razayî ye. Tu niha li asîmanê kîjan xewnê difirî Helebçe? Zarokên te mezin bûne? Sêvên te yên ku tu ji wan xeyîdîbûyî (mesela pirkujiya Helebjanê û “bêhna sêvan” a kujer, bûye navê dîwana min a yekem jî: Sêv jî me dikujin) vegeriyan malê yan na?

Ez li vir bisekinim û kurtehelbesta xwe ya di vê der barê de binivîsim:

Helepçe
bo te dara sêvê me bo te hêlîna leglegî
bo te kêfa Newrozê me
bo te sêvên şêrîn
Helepçe
Helepçe ji sêvan nexeyîdî
ji bo ku ez dixwazim têkiliya min û her tiştî ne tenê bi salveger an jî ‘rojan’ be; naxwazim hevokên bi wî rengî bidim pey hev... Lê heta em hebin dê Helebçe jî wek gulên biharek şehîd di can û ruhê me de be. Wî dîktatorê faşîst ê ku gotibû, “Kurd, ji bo wan qawanozek jehriya kêzikan bes e!” Niha di dojeha zilma xwe de ye lê Helebçe hê jî dimeşe, mezin dibe, hez dike, tê hezkirin di kesayeta her kurdî de û risteyek ji helbestek min a din: /Helebçe destên me bernede.

Zextan bi kirasên zagonî rewa dikin

M.Alî Ertaş

Li cihên ronî her tişt aşkera ye. Her kes her tiştî dibîne. Tiştekî veşarî tune ye. Her kes rastiya hev dibîne. Her tişt azad û pak e. Civakî û ehlaqî ye. Geşe û diçûrise. Xweşik û bedew e. Wêrek e. Lê cihên tarî dijberî vê yekê ne. Gelek tişt nayên dîtin. Çav rastiyan nabîne. Guh nabihîze. Difin bêhna genî hîs nake. Kesên newêrek, hîlebaz, diz, virrek, genî, qirêj, ji roniyê direvin û xwe di bin perda tariyê de vedişêrin. Ji bo serdestiya civakê, tariyê ji bo xwe dikin mertal. Li pişt mertalê tariyê serî li hemû fêlên genî û qirêj didin. Her tiştî berovajî dikin. Kî ronî bike, an wan dikişînin nava tariyê, an jî wan dikin hedefa xwe. Rojnamegerên rastiyan ronî dikin jî rastî gef, tundî, binçavkirin, girtin û cezayan tên.

Karê rojnamegeran di esasê xwe de ronîkirina civakê û ragihandina agahiyan e. Bûyer û geşedanên ji civakê tên veşartin, derxe holê û rastiyan di tariyê de nehêle. Civakê li dijî gef, metirsî, şaşî, kêmasî, talûkeyan bike xwedî agahî û ji rastiyan haydar bike. Kar û berpirsiyara rojnameger û çapemeniyê ew e ku bibe çav, guh, zimanê civakê. Bibe parêzvanê civakê. Ev pîvan û rêgezên esasî yên gerdûnî ne. Ger ku rojnameger û çapemenî li gorî van rêgez û pîvanan tev negerin, wê demê nikarin erka xwe pêk bînin. Ev sinc û pîvaneke gerdûnî ye.

Baş e, dema em li Tirkiyeyê dinêrin di qada çapemeniyê de wêneyekî çawa derdikeve pêşberî me gelo? Werin em bi hev re li wêneyê ji 1'ê adarê heta niha derketiye holê binêrin. Ev wêneyê heyî wê rastiya rola çapemeniyê û polîtîkayên hikûmetê ya ku bi zorê dixwaze her tiştî têxe kontrola xwe raberî me bike. Dema em li geşedanên civakî û siyasî dinêrin, bi aşkerayî hin geşedan pêş dikevin. Rewşa qeyrana aborî, betalî, xizanî, şer, koçberî, tenduristî û azadiya ramanê li ber çavan e. Lê yên vê rastiyê bi deng tînin ziman û parve dikin dibin hedef. Zext, astengî û êrîşên li ser çapemeniyê bi fîstan û kirasên zagonî yên hikûmetê rewa dikin. Yên kêmasiya serokomar, wezîr û rayedarên hikûmetê tînin ziman, dibin hedef.

Em li rojên dawî yên Tirkiyeyê dinêrin; meha adarê bi binçavkirin û girtina rojnamegeran dest pê kir. Di nav 9 rojên ewil ên adarê de 9 rojnameger hatin girtin. Yek li ser îtîrazê serbest hat berdan. Niha li Tirkiyeyê 118 rojnameger girtî ne. Ji destpêka adarê heta niha 3 rojnamegerên ku rastî nivîsandin û parve kirin, hatin cezakirin. 9 rojnamegerên ku ketin pey şopa rastiyan û bi raya giştî re parve kirin hatin girtin. 12 rojnameger jî hatin darizandin. Yên rastiya penaberan a ser sînor ronî kirin hatin binçavkirin û girtin. Yên rastiya MÎT'ê ronî kirin hatin girtin.

Ev tenê aliyê wêneyê ku xuya dike. Ji xeynî vê yekê malperên ajansan hatin astengkirin, rojnameger rastî êrîşan hatin. Gef li rojnamegeran hatin xwarin. Lê dîsa ser rastiyan nehat girtin. Dîsa rastiya ku eskerên Tirkiyeyê li Idlibê bûn hedefa arteşa Sûriye û Rûsyayê nehat veşartin. Rastiya penaberên li ser sînorê navbera Tirkiye û Yewnanîstanê nehat veşartin. Serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn di 5'ê adarê de serokomar û wezîrên wî pêşwazî nekirin û 2 deqîqeyan li ber derî li salonê da rawestandin. Hemû cîhan bû şahidê vê rastiyê û rûmet û dîplomasiya Tirkiyeyê xist bin axê.

Ev nîşan dide ku bi girtinê tu carî rastî di tariyê de namîne.

Vîrus ji ber polîtîkayên şaş belav dibe

Bijîjk Veysî Ulgen, têkildarî vîrusa koronayê diyar kir ku ji ber polîtîkayên şaş ên tenduristiyê berbelav dibe û got ku polîtîkaya tenduristiyê li şûna parastina civakê ji bo bazirganiyê ye

Aryan Med

Vîrusa koronayê ku li Çînê peyda bû, li gorî daneyên dawîn li seranserê cîhanê zêdetirî 120 welatan berbelav bûye. Li tevahiya welatan zêdetirî 130 hezar kes bi vîrusê ketine û nêzî 5 hezar kes jî mirine. Li gel ku vîrus bûye sedema mirina bi hezaran kesî jî ne pêşî lê tê girtin û ne jî çare jê re tê dîtin.

Ji ber belavbûna wê ya li gelek welatan, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) vîrusa koronayê (Kovid-19) weke nexweşiyeke pandemî ragihand. Pandemî nexweşiyên li tevahiya cîhanê yan jî li herêmekê belav dibin, pênase dike.WHO'yê ragihand ku kesên bi vê nexweşiyê dikevin % 81 sivik, % 14 cidî û % 5 jî bi giranî derbas dikin û heta niha nêzî ji % 2 yên bi vîrusê ketine jî mirine.

Her diçe hejmar zêde dibe

Li gorî daneyên dawî heta niha welatên vîrus herî zêde li wan belav bûye û gelek kes pê mirine, bi rêzê wiha ne: Çîn, Îtalya, Îran, Koreya Başûr, Îspanya, Fransa, Almanya û Amerîka ye. Hejmara kesên bi vîrusê dikevin û pê dimirin jî her diçe zêde dibe. Îtalya bi tevahî, li Îspanyayê çar herêm di bin karantînayê de ne. Li Amerîkayê çûnûhatina ji bo welatên Ewropayê hat betalkirin û hat ragihandin dibe ku li Amerîkayê ji 70 milyon heta 150 milyon kesan bi vîrusê bikevin.

Li welatên vîrus belav dibe, ji bo parastina ji vîrusê tedbîr tên wergirtin. Li hemû welatên ku vîrus li wan hatiye dîtin; dibistan ketin betlaneyê, çalakiyên girseyî hatin betalkirin, çûnûhatin hatin sekinandin û hwd. Ji ber vîrusê û bergiriyên tên wegirtin, derbeyeke mezin li aboriya Cîhanê dikeve.

Derbasî Tirkiyeyê jî bû

Vîrus, piştî ku li welatên cîran ên mîna Îran, Bulgaristan, Yewnanistan, Iraq, Sûriye û Ermenistanê derket, derbasî Tirkiyeyê jî bû. Li gorî daneyên fermî li Tirkiyeyê bi 5 kesan re vîrusa koronayê hatiye tespîtkirin.

Ji bo testa vîrusê li seranserê Tirkiye û bakurê Kurdistanê tenê 26 nexweşxane weke navend hatin diyarkirin. Wezareta tenduristiyê da zanîn ku ji 26 nexweşxaneyan 10 ji wan li 4 bajaran e û 16 nexweşxaneyên din jî li bajarên cuda ne. Li gorî lîsteya daxuyaniya wezaretê, ji van nexweşxaneyan 4 li Stenbolê, 2 li Enqereyê, 2 li Îzmîrê û 2'yên din jî li Bursayê ne. Di nav nexweşxaneyên wezaretê ragihandine de, Nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê ya Gazî Yaşargîl a Amedê jî heye.

Çalakiyên komî betal bûn

Demeke dirêj rayedarên hîkumetê hebûna vîrusê ya li Tirkiyeyê înkar kir. Piştî bi fermî ragihandina hebûna vîrusê, tê gumankirin ku heta niha gelek kes pê ketibin. Hefteya borî bi lez û bez ji bo bergiriyê hin biryar hatin dayîn. Ji ber vîrusê, zanîngeh jî di nav de hemû dibistan ji bo 3 hefteyan hatin girtin û biryara perwerdeya ji derve ve hat dayîn.

Gelek wezaretên dewletê destûra xebatkaran betal kir û her hiwa lîstikên werzîşê jî dê bê temaşevan bên lîstin. Ji bilî vê hemû çalakiyên komî û serdanên derveyî welatan ên rayedarên dewletê hatin betalkirin. Pêşniyar li welatiyan hat kirin ku serdanên xwe yên derveyî welat taloq bikin.

Vîrusê Newroz jî betal kir

Vîrusê bandora xwe li pîrozbahiyên Newroza îsal jî kir. Ji ber vîrusê li gel ku amadekariyên wê hatibûn kirin û starta wê jî hatibû dayîn, hemû pîrozbahiyên Newrozê yên girseyî li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê betal bûn. Heke Newroz nehatina betalkirin dê bi pêşengiya Xebata Tifaqa Kurdistanî ku gelek partiyên siyasî û pêkhate di nav de ne, bihatana pîrozkirin. Ji bo ku vîrus nebe sedema encamên giran, tifaqê ragihand ku wan piştî guftûgoyên berfireh biryar daye ku hemû pîrozbahiyên gireseyî yên Newrozê betal bikin.

Armanc qezenckirina pere ye

Me vîrusa koronayê ku bûye sedema encamên ewqas giran, bi endamê Odeya Tabîban a Amedê (DTO) bijîşk Veysî Ulgen re nirxand. Ulgen, têkildarî vîrusê nêrîn û pêşniyarên xwe bi me re parve kirin. Ulgen, diyar kir ku ji ber vîrus di demeke pir kurt de mutasyonê derbas dike, parastina ji wê li gorî bakteriyan zortir e û lewma jî heta niha parzan (aşî) jê re nehatiye çêkirin.

Ulgen, anî ziman ku yek ji sedemên belavbûna vîrusa koronayê polîtîkayên tenduristiyê yên şaş in û wiha got: "Polîtîkaya tenduristiyê ne ji bo parastina civakê ye. Armanca pergalê qezençkirina pere ye. Sedema belavbûna vîrusê jî ev pergal e. Ji bo dewletên kapîtalîst tenduristî bazirganî ye û ji ber vê jî metirsî li ser tenduristiya civakê heye."

Parastina ji vîrusê

Ji bo aşkerakirina nexweşên vîrusê ya rayedarên dewletê jî Ulgen, destnîşan kir ku hejmara nexweşên ji vîrusê ji hejmara hatiye ragihandin pir zêdetir e û ev tişt anî ziman: "Dewlet heya jê tê nexweşiyên wiha vedişêre. Di tibê de tiştekî wiha heye; tu dema di mala xwe de kêzikekê/î bibînî bawer bike ku di mala te de gelek kêzik hene. Gelek kesên nexweş naçin nexweşxaneyê.Ne tenê înkara dewletê, gel jî qels e. Gel jî çend sal in parastina xwe baş nake. Jixwe armanca me odeyên bijîşkan perwerdekirina gel û hişyarkirin e."

BijîşkUlgen ji bo parastina ji vîrusa koronayê jî çend pêşniyarên girîng û bingehîn kirin;

✓ Hev hembêz nekin, bi destên hev negirin.

✓ Dest û rûyê xwe baş bişon û dikaribin her roj serê xwe bişon

✓ Nekevin stresê lê kontrolên xwe yên tenduristiyê bi rêk û pêk bikin.

✓ Nîşaneyên nexweşiyê hebin tavilê biçin nexweşxaneyê.

✓ Çalakiyên girseyî betal an jî taloq bikin.

✓ Divê her kes bi berpirsiyar tevbigere.

✓ Bi taybetî divê alîkariya kesên xizan, kal û pîr, nexweşên bi nexweşiyên kronîk (şekir, kezeb, dil, penceşêr, tansiyon), zarok û ducaniyan bê kirin.

HUNER CARNAN LÊGERÎNA HEQÎQETÊ YE Û CARNAN JÎ REVA JI HEQÎQETÊ YE

Muzîk dikare ji janê bedewiyê derxîne

→ Rizoyê Xerzî

Di demên dawî de hin hunermendên kurd hene hemû jiyana wan bi tirkî ye lê sehna wan bi kurdî ye. Li gorî min, ev nakokiyeke mezin e. Dema peyv min di warê giyanî de di rê de dihêlê gazî muzîkê dikim û dema gotin bê fêde dibe, muzîk rêyeke gelek rind a derbirînê ye

Mem Ararat kî ye?

Mem Ararat, di sala 1981'î de li Dêrika Mêrdînê hatiye dinyayê. Di sala 1989'an de malbata wî ji ber pirsgirêkên aborî neçar maye ku koçber bibe. Sala 1991'î li gundê xwe vegeriyane lê di sala 1994'an de ji ber sedemên siyasî dîsa neçarî koçberiyê bûne. Ji sala 2000'î şûnde di platformên cuda de dest bi pêşkêşkirina deng û muzîka xwe kiriye. Heta niha albumên bi navê Quling Ewr û Baran û Kurdîka, Xewna Bajarekî, Nîştiman û xebateke (single) ya bi navê "Pîvok" pêşkêşî hezkiriyên muzîka kurdî kirine.

Mêvanê me yê vê hejmarê hunermendê dengxweş Mem Ararat e. Kerem bikin em bi hev re bala xwe bidin pirsan û bersivên wî.



Mûzîk ji bo Mem Ararat tê çi wateyê û bandoreke çawa li ser civakê dike?

Ez vê tim dibêjim : min muzîk hilnebijart. Yanî cara pêşîn muzîkê ez hilbijartim. Lewra ew her bi min re bû. Piştre dema min mafê hilbijartinê bi dest xist min jî muzîk hilbijart.

Mafê hilbijartinê ev demeke dirêj e bi taybetî li Rojhilata Navîn ji şexsan hatiye dizîn. Lewra tu di nav çand, ol, civate, malbatekê û hwd. têyî dinyayê. Tu di nav qaîdeyên gelek hişk de têyî dinê. Gelek tişt hene ji hêla erdnigariyê ve, weke mîrate li ser te dimînin. Heta di warê hişmendî de tu xwe ji bandora neyînî ya vê mîrateyê xelas nekî tu li mafê xwe yê hilbijartinê jî hay nabî. Dema tu li mafê xwe hay nebî, tu nikarî daxwazî jî bikî. Mînak: heta min tembûrek stand ez neçar mam li hember bavê xwe şer bikim, lewma li gorî hin baweriyên di civaka kurd de, tembûrjenî û stranbêjî ne li gorî kesên xwedî eşîr in û mixabin stranbêjî û tembûrjenî kêm dihat dîtin. Ev nêrîn êdî di nav civata kurd de jî qels bûye, lê hê jî li hin deveran bi bandor e.

Muzîk ji bo Mem Ararat serhildana li hember hin mîrateyên çewt e, deriyê azadiyê ye. Muzîk li xwe û mafê xwe haybûn û bi israr daxwazkirina mafê xwe ye. Muzîk daxwaza jiyînek bi serbilindî û bêminetî ye. Her wiha muzîk dema gotin bê fêde dibe, rêyek gelek rind a derbirînê ye. Muzîk di nav beşên hunerê de ya herî zû di nav civatê de berbelav dibe. Kesekî bi zimanê te nizanibe jî tu dikarî bi rêya muzîkê pê re têkilî deynî. Li gorî min rojekê kesên derdunyayî dema werin serdana vê gêrstêrka me ya ku êdî ji ber kiryarên me mirovan westiyayî ye, pêkan e em weke mirov bi wan bûneweran re bi rêya muzîkê têkilî deynin. Deng, madeya xam a muzîkê ye û em bi rêya dengan li vê wendahiyê li bedewî û wateyê digerin. Em hewl didin kêmasiyên xwe temam bikin û zaroka/ê di dilê xwe de aş bikin. Muzîk bi rêya deng hewldana danûstandinê ye jî... Deng bi wateya xwe ya esasî jî tiştekî gerdûnî ye, lewma beşek ji rasteqîniya fizîkê ye.

Êzingê agirê dilê hunermend şahî, êş û jan û bandora ji bûyerên derdorê ye, li ba Mem Ararat ev pêvajo bi berhemê çawa taceser dibe?

Dema peyv min di warê giyanî de di rê de dihêle gazî muzîkê dikim. Ew rêhevalek rind e.

Êş û nakokiyên te dema diazire, divê haya te ji te hebe, lewma tu ne baldar bî, ew azirîn dikare te noqav bike li nav deryaya reşî û nefretê. Dibe ku tenê huner karibe ji janekê bedewiyekê derîxe. Ji bo min pêdiviya hunerê di gava yekemîn de lêgerîna çareseriya muşkuleyên navxweyî ye. Lê çareseriyek mayînde li vê gerdûna ji kaos û nakokiyan afiriye ne pêkan e. Lewma huner û muzik tu carî çareseriyek mayînde diyarî mirov nake. Rast e , gelek pirsgirêkan çareser dike, lê çareseriyên wê bi serê xwe pirsgirêkên nû ne. Helbet ez vê rewşa bi awayekî neyînî nanirxînim. Lewma konfor baskê mirov xam dike. Eger pirsên te yên xedar hebin û eger navbera te û sînoran ne xweş be, jixwe jiyaneke sekinende ew ê nikaribe te aş bike. Ya rast ez hemû stranên xwe ji bo xwe dinivîsim û dibêjim, lê ji xwe tenê re hilnaynim. Lewma koça tev li êlê carna dibe seyran, carna jî dibe qeyran. Xwedê dizane mirovahî bêyî herduyan jî nikare bijî.

Tu kengî ji dil distrî û çi te ji stranê sar dike?

Min sozek daye xwe û guhdarên xwe; strana ku bi dil û giyan hîs nekim ez ê nebêjim.

Ji hemû mijûlahiyên min weke kar girtiye dest, rojek hatiye min jê nefret kiriye. Lewma di kar de mecburiyetî heye. Naxwazim xwe mecbûr hîs bikim di muzîkê de. Muzîk bexçeyê giyanê min e û dixwazim wî bexçeyî her paqij bihêlim. Bi hêvî me qet mecbûr nebim. Lewma bi hezkirinek mezin bi muzîkê re mijûl dibim. Kevirê heps û tirba xwe wisa dixemilînim.

Stranên kurdî yên folklorî bûne wekî malê talanê. Hinek stranbêj li gor dilê xwe wan stranan bi kar tînin û ji reseniya wan dûr dixin. Tu ji bo vê yekê dikarî çi bibêjî?

Deriyê xwe qet ji tiştên nû re nagirim, lê çi dibe bila bibe dema stranbêj stranek xwend, divê teqez çavkanî nîşan bide. Dema stran a kesekî/e din be, divê bêdestûr qet nebêje. Lewra ev dibe destdirêjî û destdirêjî bêrêzî û bêedebiyek mezin e. Ev şerm e. Li gorî min mirovên ji ber xwe fedî dikin tiştên wisa nakin. Helbet dibe ku stranbêj dema stranekê diafirîne di bin bandora hin stran û stranbêjên din de bimîne. Heta deverekê şibandin dikare were famkirin lê kopîkirin şermeke mezin e. Li gorî min mirovên biaqil tiştekî ku ne heqê wan be qet destê xwe dirêj nakinê. Lewma tiştekî te heq nekiribe û te wergirtibe piştî demekê ew dibe qeyd û dikeve lingê te, dibe jahr û dikeve nav ruhê te. Kesên ruhê wan azad be û ji azadiya xwe hez bikin bawer im ew ê vê yekê nekin. Dema mirov ji darekê fêkiyek jêkir û xwar, divê hinek av bide, der û dora wê tevir bike. Qet nebe divê jê re rêzê bigire. Esîlbûn ma ne ev e?

Bi ya te zor û zehmetiyên li pêşiya hunermendên kurd çi ne?

Huner carna lêgerîna heqîqetê ye û carna jî reva ji heqîqetê. Mijûlahiya bi hunerê re mijûlahiya bi nakokiyan re ye herwiha. Jixwe tu û xwe ji aş û baş ve serê hev diêşînin. Lê hunermendên kurd ji bilî vê yekê neçar in li hember kiryarên politikayên serdestan, yanî çand û ziman û çerxeyên serdest jî têbikoşin. Ev tekoşîn dikare gelek xedar bibe car caran. Wekî heps, kuştin, zext, lînç, birçîbûn û hwd.

Herwiha, zimanê kurdî di qutiyekê de asê bûye. Mixabin bi awayekî sîstematîk ji jiyana rojane hatiye dûrxistin. Dibe ku kurdî qada herî zêde lê azad e dîsa jî muzîk be, lê ji ber ku politikayên bişaftinê li ser kurdî didomin, di gelek waran de dibe astengî û li her kesên ku hunera xwe bi kurdî dikin vedigere. Mixabin asêbûna kurdî ya di qutiyê de hinekî ji sersariya saziyên kurdan e jî…

Kurdî divê bûbûya zimanê bazarê jî. Dema te zimanek ji bazarê û debarê qut kir, êdî ew ziman nikare bi rehetî bêhna xwe vede. Ziman tiştekî zindî ye û li gor pêşketin û guhertinan xwe ji nû ve saz dike. Dema ziman ji bazarê qut bû ji zikakê jî qut dibe. Zimanê di nav malê de asê bibe nikare li zikakê olan bide, êdî li cihê xwe dimîne û tişta ku li cihê xwe bimîne jî paşve diçe. Lewma dem her diherike û li benda kesî namîne. Me kurdan zimanê kurdî kiriye mîna niviştekê û darde kiriye. Herî zêde pîroz dikin û êdî emeliyê pê nakin. Lê wekî rahmetiyê Nietzsche jî gotiye, "Lanetkirin jî cureyekî pîrozkirinê ye."

Divê em vî zimanî ji nav wan niviştan û qutiyan derbixin û têxin nav laş û ruhê xwe. Ziman bi axaftinê kevn û gemarî nabe. Ew heta avek herikbar be ew ê her xwe nû bike û ew ê bi hêztir û bedewtir bibe.

Weke rexne an jî gazin dikarim ji bo hin hunermendên ku hunera xwe bir kurdî dikin jî çend gotinan bêjim: Di van demên dawî de hin hunermendên kurd hene hemû jiyana wan bi tirkî ye lê sehneya wan bi kurdî ye. Ev nakokiyeke mezin e li gorî min. Helbet mafê her kesî heye bi xwe hilbijartinên xwe bikin. Lê belê mirov nikare vê yekê di vê çerçoveyê de binirxîne. Lewma kurdiya tenê li ser dikê mayî, dereceya dilgermiya hunermend jî dide xuyakirin. Her wiha ew hunermend carna bi hemd, carna jî bê hemd dibe parçeyekî otoasîmilasyonê.

Di kurdî de divê em kurd bi israr bin. Bi gelemperî ji tundbûnê qet hez nakim lê di vê mijarê de tundbûn îro helwesteke gelekî rast e.

Zimannasên kurd dibêjin dengbêjyê nehiştiye ku zimanê kurdî bihele, folklora kurdî wenda bibe. Li gor te rol û risteke muzîka kurdî ya li hemberî asîmilasyonê heye ku pêşiya asîmilasyonê bigire?

Pişaftina herî bi bandor otobişaftin, yanî otoasîmilasyon e. Li gorî min konetiya serdestan ya herî bi bandor û xedar jî ev e. Rast e, dengbêj bi saya kilaman gelekî bûne bendav li hember vê tofanê. Lê mixabin îro camêran ew vîrus xistine nav ruhê me û em xwebixwe xwe asîmile dikin. Xerabiya serdestan a herî xedar jî dibe ku ev be. Lewma te bi destên te dikuje. Tu bêyî hemdê xwe, xwe dikujî. Li gorî min divê kurd ji xewnên romantîk hişyar bibin. Divê hişmendî were guhertin. Ev demek dirêje kurd her sal bi awayekî gelekî hişk dişikên. Ji kurdan re serkeftinek lazim e. Hişmendiya neteweyî encax bi serkeftinekê re dikare were avakirin. Di warê hunerê de, di warê zanistê û hwd... Helbet muzîka bi kurdî hêzê dide zimanê kurdî lê ev yek tenê ne bes e. Ev ziman divê derkeve kolan û bazarê…

Di hin stranên xwe de tu ne pergala dengê muzîka kurdî distirê, pergala ewropî ango tamprement bikar tînî, sedema vê yekê çi ye ?

Li gorî fikra min divê mirov guhên xwe bide çar hêlên cîhanê û dema pêkan bû divê mirov guhê xwe bide gerdûnê jî. Helbet em amûrên rojavayî jî bi kar tînin lewma guhertin û nûbûn hewce ye. Ez vê yekê bi awayekî formulatîf nakim lê belê li cîhana xwe ya hundirîn dinêrim û guhdar dikim û hemû dengên li wir olan didin derdixim holê. Ji xwe ez xwe weke kedkarê hestan dibînim. Ma ne aqilê mirove li ber deriyê dilê wî/ê xulam? Dema li ser stranekê dixebitim tu carî di qaîdeyek weke şêweya ewropî an jî rojhilatî de xwe asê nakim. Çi ji dilê min û hişê min bê û min qanih bike ew e. Lewma weke li jorê jî min got cara pêşîn ji bo xwe dibêjim û paşê jî bi guhdaran re parve dikim. Helbet weke muzîkjen stran û stranbêjên ez diecibînim bandorekê li ser min dihêlin. Ev yek tiştekî gelekî asayî ye. Jixwe cîhana mirov a hundirîn bi destên ecibandin û neecibandinên mirov saz nabe ma? Lê belê şerê min ê herî mezin bi min re ye.

Balkêş e ku tu di muzîka xwe de ji hawê (meqamê) kurdî bêtir yên rojavayî bi kar tînî, sedemeke vê ya taybet heye gelo?

Di warê meqaman de muzîka rojhilatî gelekî ji ya rojavayî dewlemendtir e. Meqamên bi piranî ez bi kar tînim jixwe di muzîka kurdî û bi gelemperî di ya Rojhilata Navîn de jî hene. Lê weke uslûb dibe ku bandora ewropiyan li ser me hebe. Camêran di warê çandî de bandora xwe li tevahî cîhanê kiriye. Lê li gorî min mirov nikare ji muzîka min re bêje rojavayî. Di warê teknîkê de dibe ku em rêbazên ewropî bi kar bînin. Lê hest her rojhilatî ye, kurd e. Mem Ararat bêguman kurd e. Lê hewl dide xwe nû bike. Hewl dide ji pirsên xwe re bersivan bibîne, hewl dide xwe dubare neke.

Stêrka Gelawêj

Yildiz Çakar

"Bihar xweş e di gulanê de xew xweş e di paxila yarê de"

Fîze fîza dengê bayê kur e, kûr dike şev û rojê. Bendewariyê qelîşteka birînan mezin dikir, derî çavên lê. Lê giran bûbû dil, devê şûrê vekirî, tahma xwe lê xweş dikir. Xweş dikir ziman, ji zêmarên miriyan. Mirî carinan serê xwe radikir ji goriçeyan:

-niviştа ne tişt xwediyê xwe kuşt.

Kuştibû bi du gotinan. Gotin êdî nedibû derman. Bexçeyê yaran ketibû ber dest û lingan. Heyfa birîndaran li erdan mabû, gotinên mêrê berê li sindoqên jinebiyan. Biyan bûbû dil ji dilan, kes heyfê nedigirt li ser milê xwe ji bo sewdayan. Gotinên erzan davêtin ber hevdû. Kilamên naylonî dikir tac li ser serê hevdû. Kes sola kesê nedihewand li ber deriyê xwe. Loma diman evîndar bi tena serê xwe. Xwe dixapandin ji roj û şevan, fîze fîza bayê kur, kûr dikirin di hembêza xwe de bi êş û eleman. Çiqas devê şûrê vekirî bike gazî û hewar û bibêje ne ji bo evînê ez mame wiha. Wiha mabûn çav di rêyan de. Rêyên ku di dilan de diqetiyan, diqetiya çavên bîrîndaran. Ne rêwî dihat, ne bendewar ji ya xwe. Hil nedihat heyv, heyv û sal dabûn pey hev. Kula ser kulan, kulavê xwe nexşandibû ji tayikên perperokan, dil dibêje heft sal e, min xew nekiriye ji şevên tarî, heta berbangên sibehan. Wiha bû çîroka me ji perîzadeyan, li Cizîra Botan ji donzdeh stêrkên peravan! Ber berê avan, bûbû bêdengiya giyanan. Giyan bûbûn macir, li çol û çiyayan.

-rêya çolan bi çiyê diket, diket dil ji xasan û bi serê çiyê diket.

Ketibûn rê, cilên kuştî û miriyan li xwe kiribûn. Qehweya tahl a ji fincanan di bin konên reş de ji qereçiyan re hiştibûn. Hiştibûn fahla wan, bi serê du mahr û dupişika sor a ji tu serdeman. Êvaran di ber xwe de dilorand...

-heylê lêlê, xewa min nayê bê te lê

...lê dibariya baran, rûkê erdê dikir xet di orta dilê yaran de. Evîna wan mabû di devê şûrê vekirî de, ne kes diçû hewara wan, ne kes dibû şahidê bêkesiya wan. Loma zehmet bû dîtina yaran, lorî diman ji kitana şil a hemû zemanan. Mabû heyfa evînê, li erdê qeraç. Soz nedibû bar êdî li tu kûloça. Qesemên li meydanan radihişt sonda xwe, didan li dû çavreşan. Çavreş bûn destanê dayikan, hine bû destê qîzan, tiliyên lawan. Bi xeliya sor bihata nixumandî jî xwedawendên van deran jê re me digo dayika mezin ji hemû dia û miradan. Miradê stûşiketî, di bin pêlavên qilêr de dikir nalenal. Nala zengarî bi benikên guliyan xwe bi dar ve dikir. Şûrê devê xwe vekirî, ba fîzîna xwe ji erdê kaş dikir. Avreşanê dikirin ji ava miriyan, li gulên ber seriyan. Şîreta dayikan piştguh dikirin.

-bi destê namerdan neçin, bila av we bibe.

Dibir taca serî, diket ber eniya vekirî. Cilên heftreng, ji deşta kesk û sor û zer, dibû bûm, li timalikan diket. Bihar bi xweşikiya xwe li xewnê şevan, stêrk yekoyeko ji ezmanê xwe diketin. Diketin xewn ji xeyalan, ji paxila yaran. Yar ji yaran re bê minet diketin. Kilama evînê bê tembûr li bergûşka hesretê diket û hêdîka di ber xwe de digo kul bikeve wî dilî, dema serê xwe nikaribe deyne ser wî emrî. Emr weke pelê daran xwe li tunebûnan pêça, kevçiyên gund û cîranan li dawetên cin û periyan. Giyanên li keviyên kendalan, ji nû ve xwe li hev civand û niviştа evînê, ji xwediyan re nivîsand:

-bihar xweş e di gulanê de, xew xweş e di paxila yarê de!

Ziman û Raman

Samî Tan

Ziman û civak

Heke yek dixwaze civakekê nas bike, divê berê xwe bide çanda wê civakê, bi taybetî jî çanda gelêrî. Bo nimûne gotinên pêşîyan di vî warî da gencîneyeka bêhempa pêşkêşî mirovî dikin. Helbet dema mirov dixwaze civakekê nas bike, mirov bi tenê berê xwe nade alîyên erênî, belkî bi qasî wê mirov divê bala xwe bide alîyên neyînî jî.

Vê hefteyê me divê bi çend gotinên pêşîyan bala xwe bidin civaka kurd. Her gotinek bi salan di nav dil û mêjîyê civakê da hatiye palaftin û dawerivîye û gihaştina roja me ya îroyîn. Lewma jî ew gotin di nava xwe da peyamên pir xurt dihewînin. Bo nimûne, gotina ku dibêje, *"Ava di golê da bimîne, dê genî bibe."* bi awayekî pir xweş balê dikêşe ser pêwîstîya kar û xebatê, liv û bizava di nava jiyanê da. Civaka ku tê da liv û tevger, kar û xebat tune be, dirize, ji hev dikeve.

Carinan bi tenê mirovek dikare navê civakê xera bike, li ser vê yekê jî pêşîyên me gotiye, *"Çêlekek rîxo garanekê dilewitîne"*, li gorî mantiqê pergala takeperest, her kes ji xwe û kirinên xwe berpirsyar e, lê rastî ne wisa ye, mixabin kirin û gotinên xizmên mirov, der û cîranên mirov jî bandorê li jîyana mirov dikin. Li hemberî vê yekê jî gotinek heye ku balê dikêşe ser wê yekê ku kesên bedkar, dilreş nikarin hemû civakê xera bikin. Lewma jî wan gotiye, *"Behr bi devê se nalewite."*

Pêşîyên kurdan ji mêj ve girîngîya "hiş û aqil" fehm kiriye û lewma jî wan gotiye *"Aqilê sivik barê giran"* her wiha ew gihaştine wê bîr û bawerîyê ku hiş û aqil pir girîng e, lê wisa bi hêsanî jî bi dest nakeve, lewma wan gotiye, *"Aqil taceka zêrîn e, li serê her kesî nîn e."* Ji ber vê yekê di civaka kurdan da kesên herî xeternak ev in ê ku bi nezanîya xwe nizanin, lewma jî ji kesên wiha ra dibêjin, *"Nizane ku nizane"*.

Bi tecrûbeya salan pêşîyên me gihaştine wê bîr û bawerîya ku divê mirov bi keda xwe hin tiştan bi dest bixe. Lewma jî wan gotiye, *"Tiştê ku destê mirov ji mirovî ra dikin, bav û birayê mirov nakin."* Dîsa bi heman bawerîyê wan gotiye, *"Çavê li derîyan xwelî li serîyan"* an jî *"Siwarê hespê xelkê tim peya ye"*. Gotineka din a ku bi heman mebestê hatiye gotin jî ev e: *"Heta kefa destan reş nebe, tehma devê mirov xweş nabe"*.

Encameke ku ji tecrûbeya bi hezaran salan derketiye jî ew e ku qencî qencîyê, xerabî xerabîyê bi xwe ra tîne. Lewma jî pêşîyên me gotiye, *"Çê kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro."* Gotineka din a ku bi heman mebestê hatiye gotin jî wiha ye: *"Mişkê kor çi qas axê bikole bi serê xwe da dike"*. Bi kurtasî *"Tu çi biçînî, tu yê wê biçinî."*

Pêşîyên kurdan bi domana demê ra gihaştine wê bawerîyê ku divê mirov kar bispêre ehlê kar, lewma jî wan gotiye, *"Nan bide nanpêjan bila nanek zêde bin"*. Her wiha ramaneke nêzî vê jî ew e ku kesên ku bi tiştekî nizanin, qîmeta wî tiştî dizanin, lewma jî wan gotiye, *"Qedrê gulê çi zane, kerbeş dixwe kerê reş"* an jî *"Dur bide durnasan"*.

Ji bilî van gotinn hinekên din jî hene ku bi çavekî din li meseleyê dinêrin, her wekî *"Bira bira ye, bazar cuda ye"* hinekî bêhna hişmendîya kapîtalîst û ezezîyê jê tê. Gotineka nêzî wê jî ew e: *"Lêv ji diranan pêştir in"*.

Bi kurtasî xwî û xisleta me, bîr û helwesta me di nava çanda me da veşartî ye. Lewma jî heke em dixwazin xwe nas bikin, divê em berê xwe bidin çanda xwe, nemaze jî çanda devkî. Ji bo vê yekê jî divê em zimanê xwe bizanin, ji ber ku dergûşê çandê jî ziman e.

Edebiyat û prestîj



Samî Hêzil

Eger em bi şêweya navlêkirina Pascale Casanova bibêjin, di Komara Wêjeya Cîhanê de meseleya prestîjê di çarçoveya endustriya çandî de bi awayekî gelemperî çareser bûye û kevir û kuçan cihên xwe girtine. Reytînga nivîskar, weşanxane û reklam û sponsor, cureyên edebî û ref û katalogên wan, xelatên girîng û dora nivîskarên gewre yê wergirtina wan xelatan, çalakiyên edebî û faktorên din tev cih û pileya xwe dinasin di nav vê endustriya hegemonîk de.

Lê ne pêkan e ku qala heman sazbûn û cihdîtina wan hokaran ji bo hemû ziman û edebiyatan bê kirin. Mixabin ji bo Edebiyatên Biçûk û Edebiyatên Gelên Bişaftî rewş ne zelal e; û sergêjiya ku têgihên din ên têkildar ên wek popûlerî, kanon, nirx û qîmetdayîn bi xwe re çêdikin jî pêre. Rast e, di cîhana newekhev de edebiyat jî ne wekhev in. Edebiyatên Bakurê Cîhanê bêhna yên başûr çik dikin, bayên nû tim ji rojava ber bi rojhilat digobilin. Dîsa jî edebiyat ne qada stûxwaran e, û ew dijderketinên edebiyatên welatên dorhêlî ya li hember ên navendî nîşana vê yekê ye.

Prestîj tam di vê niqteyê de wek hecetek hêvîdarbûna entelektuelî dikare bê kardarkirin. Lewra prestîj di rûberîhevbûna edebî ya kolonyalîst û madûnan de wek şûreke du hêlên tûj dikare sûretên her kesî hilû bike. Her çiqas bi derbên hegemonîk terîf girtibe jî, ew malê kasiban e jî. Hem vejena takekesî û hem jî ya girseyî bi halê xwe yê rût î tazî li dorhêla prestîjê çeng didin. Prestîj têgeheke populer e û bala mirovê îroyîn tim li ser wê ye. Di ser de jî, derdê prestîjê ne derdê îro ye. Li duh, serdema navîn, qesta Xanî ku behs dianî ser nebûna xerîdaran, şemirandina durrî û vexwarina durdê, kêm zêde qala heman tiştî dikir û derdê wî jî bê guman bilindkirina prestîja zimanekî bû; û îro jî rûyê mehçûb û gotinên şikestî ên kurdên tirkînûs -gava ku axaftin tê ser tercîha wan a zimanî- û rewşa kurdînûsên ku ji ber kêmbûna xwîneran û ji nenasiyê xwe wek mehkûmên qederê dibînin lê dîsa jî dêla wan tîk e, tev bi mijara prestîjê re girêdayî ye.

Li cîhana îro, prestîj hem ji bo terîfa nasnameyî û hem jî ji bo jixwe-baweriya girseyî têgihek kartêker e. Arîşe pê tên çareserkirin, qusûr pê tên vêşartin, xulase, hebe nebe divê prestîja we hebe. Di vê niqteyê de pirsa sereke xuya ye ku divê ev be: Gelo di nav qadên hewldanê yên vejîner de, ku qesta me şiyarkirina hestên welatperwerî û vepênasekirina nasnameya neteweyî ye, cihê edebiyatê û derfetên ku edebiyat dabîn dike çi ne? Dijwarî û reqabeta ku edebiyat ji bo bidestxistina prestîjê pêşkêş dike beramberî qadên din çawa ye û derfetên ku ew derdixîne holê çi ne?

Vêca pirs bi xwe re pirsan tîne. Xilasker-ku behsa yekî/ê bê kirinkî be, cureyên edebî an jî takekesên populer? Tişta ku afirîneriya edebî motîve bike, prestîja edebiyatekê bilind bike û xwîneran mobîlîze bike, gelo, dawiya dawî dê efsûna li dor curey(ek)ên edebî be an jî dê bi karîzmaya nivîskar pêşde were? Wek mînak romana ku wan sêsed salên dawî hema bêje cureya sereke ya edebiyata cîhanê bû û belkû jî amraza herî kêrhatî bû ji bo xwe-nasîn û xweterîfkirinê, dikare auraya edebiyata kurdî geş bike (helbet bi şertê ku romanûsên me serê xwe bi teoriya vegêranê bibijiqînin beriya ku du paragrafan binivîsin, zanista psîkolojiyê serûbin bikin beriya ku karakterekî biafirînin û li dora cîhanê seferekê timam bikin beriya ku behsa gund û tax û bajarê xwe bikin.)

Tercîha nivîskar a nivîsîna bi zimanê lokal, neteweyî an jî bi zimanê cîhanî arîşeya têkildarî prestîjê heya çi radeyê çareser dike? Mînak, eger romanûsek zaza ku bi hinceta xwe-gihandina zêdetir xwîneran bi zazakî nenivîse û wek tercîha xwe ya duyem jî li şûna kurmancî bi tirkî binivîse. Axiriyê ew camêr an jî canik, di hunera xwe de çiqas serkeftî be jî, tev kar û keda wî/ê dê wek kevirê Sîsîpûs ji lûtkeya çiyê gulolî jêr be û serê me kurdan bibijiqîne! Bila tu kes bi şîroveya xeleta unîversalîzmê xwe nexapîne!

Prestîja nivîskar û prestîja berhemê, hevbandorên wan ên ku bi şêweyên cuda xwe didin kifşê jî xaleke din a mijarê ye. Bi xatirê prestîja nivîskar berhem ji tîrên rexneyê tê parastin, mînak neheqiya li birêz Demîrtaş hatiye kirin û hezkirina civakê ya ji bo şexsê wî heta radeyekê dibe mertal ji bo nirxandin û rexneya berhemên wî.



Berovajî vê jî, bi xatirê berhemê vêca nivîskar tê parastin. Di edebiyata kurdî de pêkanîna hin karên zehmet û qîmetbilind gelek caran dibe toleransa şexsiyeta kirêt a xwediyê kar (ev yek bê mînak be baştir e).

Li meydana edebiyata kurdî ya roja îro aliyeke têgiha prestîjê ber bi berhem û nivîskarê populer ditewe û wêneyên takekesên şiklnûjen nîşan dide û zêdetir bi amrazên ragihandinê û bi medyaya civakî, bi kombûna li dora stêrkên wêjeyê û bi parvekirina egoyê -bes ne bi awayekî wekhev- zîq dibe; li aliyê din jî qîmeta demdirêj û dîrokî, berhemên klasîk û şairên qedirşînas û peyrew û hezkiriyên wan hene ku helwesta wan dişibe tevgerên vejîner ên cimaetên dilsozan. Domahî û encamên vê rikêbî û hevhêrandinê hîn nediyar in. Em ê bijîn, bibînin û şîrove bikin.

Wek aliyê sêyem jî, şîroveya der barê rola jinên kurd ên rewşenbîr de divê. Rast e, jinên kurd, bi taybetî yên rêxistî, jiyaneke çalak dijîn û xwedî li arguman û mottoyên xwe derdikevin di çarçoveya têgiha zayenda civakî de. Lê hebûna edebiyateke têkildarî nasnameya jinê ya civakî di heman asta çalakbûna jinê de ye gelo? Heta kengê em ê mînakên xwe bi 'Simone' û 'Virgina'yan bidin. Angaştên edebî yên mêyane nînin ku meydanê li serdestiya mêran a di rojeva edebiyata kurdî ya teng de bixwazin. Ma ne barê prestîjê barê wan e jî.

Çîroka prestîjê û çîra vê dirêj e. Dîsa jî, bawer kim em kurtebiriya gotinê wiha bikin baştir e; gelo em dişên pênaseya xwe ya prestîjê -kêm zêde hevpar û pejirandî- bikin û bi pîvanmetreyên xwe hem bejna nivîskar û hem jî ya berhemên xwe bipîvin. Azweriya afirîneriyê û agirê ku sotemeniya serpêhatiya giyanê mirov e, li gel reqabeta hevdem, çima edebiyata me kurdan jî bi xwe re nebe! Belkû ne bi bayê bezê bes hêwaş û hêwaş!

Aborî û Civak

Ramazan Tunç

ramazan.tunc@live.com

Wuhan kuxiya, hemû cîhan bi zekemê ket

Piyaseya navneteweyî ya aborî û finansê di van rojan de ji ber nexweşî an jî vîrusa koronayê ya ku wek Covid-19 hatiye binavkirin gelek bi tirs û xof, qurifiye û di nav panîkeke mezin de ye. Ji Mûsa pêxember heta niha wek di pirtûkên pîroz û belgeyên nivîskî de jî tê gotin, têsîra nexweşîn û qurfê ya li ser desthildaran û her wisa li ser amûrên hilberînê gelekî zêde ye. Di dema desthildariya firewnên Misrê de Mûsa pêxember bi pêşbînî dibîne ku dê nexweşînek li bajarên wan derkeve, biryarê dide ku hemû kesên ku li ser şopa wî ne hişyar bike û alîgirên xwe diparêze. Lê nexweşîn di bajaran de belav dibe û aboriya welatiyan têk diçe. Ajalên malan telef dibin û qeyraneke civakî û aborî dest pê dike. Di dawiyê de ji ber ku desthildar çareseriyê ji bo belavbûna nexweşiyê nabînin, desthildariya xwe wenda dikin.

Panîk (rush) her tim li ser biryarên aborî û finansê û her wisa li ser borseyê (guhertingeh) bandorên gelek mezin dikin. Her çigas gotinên wek hêvî, tirs, qurf (panîk) ji bo mirovan tên bikaranîn jî ev gotin di nav pergala aborî û finansê de jî ciyekî gelekî girîng digirin. Piyase li gor birêvebirina hêviyan tevdigere. Herge ji bo pêşerojê hêvî xurt bin, baweriya bi piyaseyê zêde dibe û gel dixwaze zihakariyê bike, hilberîner jî dixwazin rêjeya hilberînê zêde bikin da ku daxwaza piyaseyê pêk bînin.

Di piyaseyê de bawerî û hêvî ji bo senedên parê û endeksên guhertingehê jî gelek girîng in. Ji bo hemû sektoran û şirîkatiyên ku di nav pergala finansa navneteweyî de cî digirin endeks hene. Di van endeksan de dan û standina senedên parê pêk tê. Aborînas Harry Markowitz di xebatên xwe yên der barê piyaseya serbest de li ser têsîra biryardayîna ji bo senedên parê dibêje, ku pêwistî bi piyaseya bandêr heye, di vê piyaseya bandêr de her kes li gora dîtaneya hêviyên rastîn tevdigere.

Di hîpoteza piyaseya bandêr de endeks jî li gora daxwazên ji bo senedên parê dadikevin û bilind dibin.

Di van demên dawîn de kadîbûnê (globalîzm) piyaseya bandêr xistiye yek torbeyî. Yek ji qeyranên aborî yên herî mezin ên cîhanê ya ku di sala 1929'an de li Amerîka û Îngilîstanê dest pê kir. Piyaseya serbest gelek qeyran û rojên bi panîk derbas kirin. Ji ber vê a niha endeksa tirsê ya ku bi navê VIX tê binavkirin, ji bo pêşdîtina qeyran û qurfa piyaseyan tê bikaranîn. Di demên panîkqurfê de guherbarî (volatility) zêde dibe. Niha endeksa guhêrbariyê li gora 10 salên dawîn derketiye asta herî jorîn. Sedema derketina vê astê bi piranî qurifina ji vîrusa Coronayê ye. Piyase ji ber vîrusê qurifiye û hemû welatên ku hilbirîneke

zêde ji bo piyaseya nevnetewî dikin, fabrîka dane sekinandin. Komara Gel a Çînê ku bazirganiyê bi hemû cîhanê re dike a niha ji ber Covid-19'ê li gelek deveran fabrîka dane sekinandin. Ne tenê Çînê, li Îtalyayê, Îranê, Iraqê û li gelek welatan ev vîrus belav dibe û jiyanê dide sekinandin. Ji ber ku jiyanê disekinîne, bi piranî sektora turîzmê, hilbirîna rasterast û sektorên wek enerjiyê yên nerasterast jî di bin tesîr û gumana vê qurfa piyaseyê de dimînin. Lewra a niha rewşa senedên parê yên şirîkatiyên ku di sektorên enerjî, derman û turîzmê de ne xerab e û di endeksan de dadikevin. Ji ber ku hilbirîn kêm dibe, daxwaza ji bo enerjiyê jî kêm dibe. Lewra di pergala navnetewî de, di carekê de rêjeya buhayê petrolê %30'î zêdetir daket. Piştî qeyrana petrolê ya salên 1970'yî ev daketin, daketina herî zêde ye. Têsîra daketina nirxên senedan li hemû pergalê belav dibe. Hin hikûmet ji ber belavbûna vê tesîrê gelekî tengasiyê dikişînin, ji ber ku pergala navnetewî ya fînans û guherkariyê bi hev ve grêdayî ye. Di vê tevliheviya ku ji ber Covid-19'ê derketiye kesên zihakar naxwazin ji mala xwe derkevin û ev jî daxwaza ji bo mal û xizmetan kêm dike. Li Sûka Stenbolê ya Sergirtî bi tenê rêjeya muştêriyan ji sedî 60 daketiye. Ez bawer im ku di piyaseya bandêr de wek ku Markowitz aniye ziman ew ê têketina malan jî û hilberîn jî kêm bibe. Di nav zihakaran de qurf heye. Ev qurf roj bi roj belav dibe û piyasayê dixe tengasî û qrîzê, ku ev tengasî li hemû sektor û deveran bandor dike, fabrîka tên girtin, bêkarî zêde dibe, betlaneyên dibistanan dest pê dikin û di nav vêpanîkê de jiyan disekine.

Ji ber ku piyaseya Manhattanê ya guhertinegeha New Yorka Amerîkayê navendeke ji bo dan û standina senedên parê ya bi dehan salan e, kesên ku di vê guhertingehê de cî digirtin digotin "Erge Manhattan bikuxe, ew ê cîhan bi zekemê bikeve." A niha jî li Çînê Wuhan kuxiya û hemû cîhan bi zekemê ketiye. Ev bandor wek bandora nexweşiya dema Mûsa Pêxember dê desthildariyan bixe tengaviyê yan na, wê wext nîşan bide. Lê wisa aşkera ye ku li Tirkiyeyê qeyran zêde dibin û gel, karsaz û zihakar dibêjin "Sal bi sal xwezî bi par."

Ferhenga Aboriyê

Endeksa Tirsê-VIX (Endeksa Guhêrbar) (Fear Index-VIX): Endeksa guhêrbariyê ye ku tirsa piyaseyê nîşan dide. Ev endeks di demên qeyran û qurfê de bilind dibe û di demên bihêvî de jî dadikeve. Wek nîşanekê ye.

Guhartingeh (Borsa-Exchange): Menzel an jî ciyê ku dan û standina mal û xizmetan lê pêk tê. Guhartingeh ji bo mal û xizmetan jî dibe û ji bo senedên parê jî dibe. Di piyaseya finansê de bi piranî ji bo borsayên ku sened tê de tên standin û firotin, tê bikaranîn.

Dîtaneya Hêviyên Rastîn (Rational Expectation Theory): Li gor teoriya aboriya makroyê kes li gor sê prensîban tevdigerin. Yek; ji bo ku berjewendiyên xwe zêde bikin li gor hêviya xwe, du; li gor agahiyên ku li piyasayê hene; sê li gor tecrûbeyên xwe yên berê.

Teoriya Daxwazê (Demand Theory): Xwestina ji bo mal û xizmetan, ku zihakarên piyasayê bi nirxê pere dikarin piştgiriyê bidin. Teoriya Daxwazê dibêje; wexta ku ji bo mal û xizmetan daxwaz zêde be buhayê wan zêde dibe, erge daxwaz kêm be jî buha dadikeve.

Gotinek ji gotinên pêşiyên me:

Sal bi sal xwezî bi par: Ji bo rewş û tiştên ku gav bi gav ber bi xerabiyê ve diçin tê bikaranîn. Wexta ku hêvî kêm dibe roj bi roj kes xweziya xwe bi rojên derbasbûyî tînin.

Xweşkanî

Felemez Ulug

Rûsya di kemînê de ye

Di bin navê şerê li dijî DAIŞ'ê de gelek welatên cuda xwestin di siyaseta herêmê de bibin xwedî gotin û di van planên jinûavakirina herêmê de cihê xwe bi awayekî aktîf bigirin.

Dewleta tirk jî yek ji van dewletan e. Lê di pratîka di van çend salên dawî de derket holê ku dewleta tirk bi emelê xwe ve ji avakirin û çêkirinê zedetir di herêmê de xirabî daye avakirin. Bi taybetî li herêma Idlibê û bi dagirkeriya Efrînê ve, dewleta tirk bi hevkariya komên çete xwest ku li herêmê li dijî planên jinûveavakirinê derkeve û di ya xwe de israr bike. Heya radeyekê gelek hêzên navdewletî li dijî vê polîtîkaya dewleta tirk bêdeng û bêhelwest man.

Dewleta tirk di vê pêvajoyê de xwest ku bandora xwe ya li ser komên çete û avantaja xwe ya erdnîgariyê wek amûrekê gefê li ser siyaseta herêmê bi kar bîne. Di vê mijarê de Ewropa bi penaberan ve, Amerîka û NATO bi hevkariya Rûsya ve, Rûsya û rejîm jî bi êrîşên komên çete yên li ser herêmên di bin kotrola rejîmê de ne, her tim tehdît kir. Yanî vê her tim di siyaseta herêmê de wek kozeke şantajê bi kar anî. Lê di roja me ya îroyîn de hevsengî û siyaseta herêmê hatine guhertin. Ji ber vê yekê jî êdî şantajên dewleta tirk li ser hêzên navneteweyî mîna berê ne bi bandor in. Mînaka vê ya herî berbiçav jî bûyer û pevçûnên li Idlibê ne.

Wek di van pevçûnan de jî derket holê dewleta herî ji van emelên desthilatdariya Erdogan acize Rûsya ye. Rûsya ji bo hebûna xwe li herêmê xûrttir bike û di planên jinûveavakirina herêmê de bibe xwedî gotin peyamek vekirî û bi bandor da Erdogan. Di heman demê de ev peyam di herêmê de hêza Rûsya ya siyasî û leşkerî jî radixe ber çavan. Her çiqas di vir de mijara gotinê pevçûnên di navbera Rûsya û Tirkiyeyê de bin jî li gor min Moskov bi van êrîşan be xwe peyamek bide dewletên rojavayî jî. Ji ber ku hin dewletên mîna Amerîka, Almanya û Fransa di nav de naxwazin Rûsya li herêmê bibe xwedî hêz û di herêmê de bibe xwedî biryar. Lewma ji bo dewleta tirk di vê rêyê de kêşeyan ji Rûsyayê re derbixe, her tim ji hêla van dewletên koalîsyonê ve hat piştgirîkirin. Lê di vir de ya şaş û ecêb ew bû ku Enqere tu carî nexwest vê lîstikê bibîne û xwe wek hêza siyaseta herêmê didît. Bawer dikim piştî rewşa li Idlibê qewimî û şûn ve kêm be jî wê ew kesên li Enqerê di qesra 1150 odeyî de rûdinên bikaribin hin tiştan bibînin.

Di hefteya borî de ji bo pevçûnên li herêmê bi dawî bibin li Moskovê serokdewletê Rûsyayê Vlademîr Vlademîrovîç Pûtîn serokkomarê tirk Erdogan qebûl kir. Ev hevdîtina ku di atmosfereke pir germ de pêk hat, ji gelek pirsan re bû bersiv lê ger siyaseta dewleta tirk a Idlibê neyê guhertin û rêveberiya Erdogan di herêmê de nekeve nav hewldanên çêker dê ev agirbesta ku bi niyeta baş pêk hatiye têk bibe. Rûsya di halê heyî de niha li herêmê li gor peyman û sozên hatine dayîn emelên dewleta tirk dişopîne. Rûsya niha di kemînê de ye û li bendê ye ku tirk sozên ku dane pêk neynin. Ger sozên dane pêk neyên, wê demê dê dewletên rojavayî nikaribin Erdogan û Tirkiyeyê êrîşê ji êrîşên Rûsyayê biparizin. Lewma di hevdîtina li Moskovê de Rûsyayê bombeyek xistiye paşila Erdogan û niha derdê wî ew e ku xwe ji vê bombeyê xelas bike.

Bi kurtasî mirov dikare bêje dewleta tirk li herêmê bû qurbana nefsa xwe. Lewma li şûna ku dê di siyaseta jinûveavakirina herêmê de bibûya hêza sereke, bû hêza taşaron.

Di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de qonaxeke nû

Mem Avba

Şerê cîhanê yê sêyemîn bi hemû lez û beza xwe didome. Bêguman zilhêz, ango hêzên hegemonîk jî tê de hemû dewlet û hêz bi awayekî tevlî vî şerî bûne. Lê belê navenda vî şerî jî weke gelek şer û qonaxên dîrok diyar kirî, dîsa Rojhilata Navîn e! Lewre li herêmê ewqas geşedan li ser hev diqewimin ku mirov nagihêje lez û beza wan.

Ji lez û bezê qesta me ew e ku serê her sedsalê carekê pergala dewletî şerekî cîhanî yê parvekirin û rêkûpêk-kirinê dertîne û hindik maye ku qewlê Peymana Lozanê biqede. Çawa ku sedsala borî bi Sykes-Pîcot peymana parvekirina Rojhilata Navîn pêk hat û li ser esasê wê peymanê şer, tifaq, lihevkirin û dijminatî çêbûn; ne dûrî aqilan e ku niha jî heman hêz bi heman awayî peymanek çêkiribin û dixwazin êdî bigihên encamê. Dibe ku em piştî sedsalî hûrgiliyên îro diqewimin, fêr bibin. Çimkî tiştek di tariyê de namîne û teqez rojekê wê derkeve roniyê.

Gelek caran û gelek kesan nivîsiye, şîrove kiriye ku xisleta vî şerî û vê heyamê, dîsa taybetmendiya aliyan, ne weke yên beriya xwe ne; gelek navhevreyî, aloz, tevlîhev û piralî ye. Şerê cîhanê yê sêyemîn bi şerê Kendavê dest pê kiribe jî, bi destwerdana DYA'yê ya li Iraqê bi awayekî fermî dest pê kir. Piştî wê navbereke kêm ketibê jî, bi pêvajoya 'Bihara Gelan/Bihara Ereban' re ji nû ve dijwar bû û heta niha jî bi hemû şewatgeriya xwe ve didome.Weke me li jor destnîşan kirî xisleta vî şerî pir-reng e. Ango ne xwedî xisleteke 'reş-spî' ye. Di navberê de reng û dengên gewr jî hene. Bi gotineke din tifaq, lihevkirin, enî û hevpeyman rojane tên guhertin. Şer bûye şerê dîplomasî, enformasyon-ragihandin, îstîxbarat û teknîkê. Cîhana du enî, niha bûye hezar enî û alî. Ango ka û ceh tevlîhev bûye; kî dostê kî ye, kî dijminê kî ye, bi xetên stûr ne diyar e!

Di vê dorhêlê de li Rojhilata Navîn welatê ku rastî destwerdanê nehatî, tê de şer û hilweşîn pêk nehatî hema bêje nema; ji bilî her du 'hegemonên herêmî' Tirkiye û Îranê! Her çiqas weke Iraq, Sûriye yan jî welatekî dîtir destwerdana leşkerî li van welatan nehatibe kirin jî, li piştperdê rastî gelek destwerdanên aborî, dîplomatîk, siyasî hwd hatine. Her çiqas ev her du welat birînên xwe nîşanê kesî nedin jî, gelek birînên wan ên xwîn jê tê û êdî nayên dermankirin hene. Xala hevpar a birîna van her du welatan jî 'pirsgirêka kurd' yanî birîna ji kurdan e!

Li aliyekî ambargoya aborî, li aliyê din dorpêç û tecrîda siyasî, ji aliyê dîtir nexweşiya Vîrusa Corona hema bêje ji her aliyî ve Îran aniye ber hilweşînê. Jixwe li gorî angaşt û gotegotên li nepeniyên kolan û taxên civaka 'cîhana duyemîn' digerin, ev ne nexweşiyek e, destwerdaneke DYA'yê ya li dijî Çîn û Îranê ye! Bêguman rastiya vê çi ye û ne çi ye, em niha nizanin. Lê belê rastiyek heye ku ev her du 'zilhêzên herêmî' niha di rewşeke aloz û kaotîk de ne, nediyariyeke tarî li pêşiya wan e û destên kurdan gewriya wan dişidîne…

Heke em li geşedanên van demên dawî pêk hatî binêrin dê rewş baştir bê fêmkirin. Şerekî gelek zirav lê bêhempa di navbera DYA û Rûsyayê de pêk tê; lê yan bi wekaletî yan jî sernixumandî ye. DYA ku hê jî sedema wê ya rastî tam nehatiye fêmkirin, ji nişka ve biryara vekişîna ji Sûriyeyê da. Piştî wê Rûsyayê bi dewleta Sûriyeyê re li qadê înîsiyatîf girt destê xwe û gelek pêş de çû.

Dewleta Tirk a ku dualî dilîze, dixwaze li djî DYA'yê Rûsyayê, li dijî Rûsyayê DYA'yê bikar bîne, hat dawiya lîstika xwe. Lewre her du zilhêz jî di ferqa vê lîstoka Tirkiyeyê de bûn û ji ber xisleta şer a li qadê heta cihekî çavê xwe jê re digirtin. Lê 'reva pişîkê heta kadînê ye' û niha pişîk di kadînê de asê maye! Jixwe ev çend sal in ku dewleta Tirk geh bi çeteyan, geh bi penaberan, geh bi Rûsya û S-400'an gef li DYA û YE'yê dixwe. Qêre qêra serok-komarê Tirk bû, tilî li DYA û YE'ê dihejand. Lewre dijberî û nerazîbûneke zêde ya li dijî desthilatdariya Tirk çêbibû.

Rûsyayê, piştî li qadê destê xwe xurt kir, li dewleta Tirk vegerya û di şevekê de bi sedan leşkerên wê kuştin. Bi wê nema; serok-komarê Tirk bi awayekî ku rezîl û riswa bike li ber deriyê qesra xwe weke parsekan rawestand û rûmeta wî kire pênc pere! Dîsa rayedarên Rûsyayê ragihandin ku pergala S-400 bi temamî nedane dewleta Tirk û di mijara Sûriye û çeteyan de dewleta Tirk sûcdar kir…

DYA, bi awayekî awarte bi El Qaîdeyê re rûnişt û peymaneke nepenî çêkirin û diyar dibe ku ev lihevkirin li ser esasê dijberiya Rûsyayê pêk hatiye. Saziyeke DYA'yê ya xwedî bandor belav kir ku dibe li Tirkiyeyê careke din darbeya leşkerî çêbe.Li Tirkiyeyê jî pêşketina hinek bûyerên darazî û siyasî, dibêtiya vê angaştê piştrast dikin.

Li ser daxuyaniya serokkomarê Tirk, rayedarên DYA'yê dan zanîn ku pergala Patrîotê nedane dewleta Tirk û heta dev ji pergala S-400 bernede nadin jî.Bi van geşedanan re hevdem, beşeke ku ji nav AKP'ê veqetiyayî kete tevgerê û partiyên siyasî ava kirin û wisa diyar dibe ku hesabên ji bo pêşerojê hene.

Li aliyê din, bi awayekî ku rastiya wê hêj tam nehatiye fêmkirin, li Girava Îmraliyê şewatek derket û di carekê de berê gelê kurd û raya giştî ya Tirkiyeyê veguherî ser vê şewatê. Her çiqas şewateke weke ji rêzê bixuya jî guman û fikaran tîne bîra mirov. Mînak çima di demeke wiha de rojeveke wiha hat çêkirin. Gelo ev şewat ji aliyê kî ve û bi çi hesabî hate derxistin. Şewateke ji rêzê ya ji cixare yan jî bêxemiya leşkrên Tirk bû, yan jî di rastiyê de dewleta Tirk peyam dida gelê kurd û Tevgera Kurd?

An jî gelo ev şewat peyameke zilhêzan bû? Ango zilhêzan peyam dan dewleta Tirk û xwestin eyar bidinê û binîn ser xet û daxwaza xwe, yan na dê 'di agirê kurdan de bişewitînin'? hwd gelek pirs û 'gelo' têne hişê mirov.

Dîsa piştî şewata li Giravê, di hevdîtina malbatan de rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bal dikêşe ser têkoşîn û xeta Rojavayê Kurdistanê û bi israr bal dikêşe ser 'lingê sêyemîn ê masê' ango bal dikêşe ser xeta sêyemîn û xurtkirina tevgera kurd. Gelo ev tên çi wateyê? Cara yekem e Ocalan, bi eşkere bang li dewletê nake û bi giranî bang û xîtabê Tevgera Kurd dike û qala xurtkirin û bilindkirina têkoşînê dike. Niha her kes çav li rê ye ka dê bersiva tevgera kurd û dewletê ya van derbirînan çi û çawa be! Bi kurt û kurmancî pêvajoyeke dijwar û bi nediyariyan dagirtî li pêş e ka dê biqulibe kîjan teşeyê!

Li Idlibê amadekariyên şerekî giran

Mihemed Seydî

Aloziya Sûriyeyê niha li Idlibê aliqiye. Yên naxwazin aloziya li Sûriyeyê çareser bibe niha li Idlibê bi hemû hêza xwe di nav tevgerê de ne. Yên naxwazin şerê navxweyî bi dawî bibe, kuştin û wêrankirin biqedin, destekê didin van komên El-Qaîde û Nûsrayê li Idlibê. Di destpêka sibatê de agahî hatin parvekirin ku 4 endamên payebillind ên îstîxbarata rûsî li derdora Idlibê hatine kuştin. Piştî wê rûs zêde aciz bûn û nema xwe li sozên dewleta tirk ên derxistina van komên radîkal (Nûsra û Huras El-dîn) ragirt û bi hêz kete nav tevgerê. Heta riya M5 kontrol kir û gelek dever xistin kontrola hêzên rêjîmê. Her wiha 8 xalên tirkan ku ji wan re digotin ên çavdêriyê hatin dorpêçkirin.

Hin caran dibêjin ew ê feydeya van xalan çi be di nav hêzên rêjîmê de û wê bi kêrî çi werin ev xal? Lê ya dixuyê ew e ku ne rêjîm ne jî Rûsya ji van xalan niha ne aciz in. Ji ber ku ev hêzên tirk ên li van xalan niha wekî dîlên di destê Rûsya ûr-Rêjîmê de. Ji ber wê ewqasî behsa, çima dewleta tirk xwe nakişîne nayê kirin.

Erdogan ji bo hêzên rêjîmê heta dawiya sibatê muhlet dabû ku divê xwe bikişînin piştxalên çavdêriyê yên leşkerên tirk ên ku bi hevpeymana Soçî û Astanayê hatibûn diyarkirin. Lê sibat çû û adar gihişt nêvî û zimanê serokê tirk Erdogan di devê wî de ma û niha nema dikare qala van xalan jî bike.

5'ê adarê serokê Tirkiyeyê Erdogan û wezîr û kizîrên wî berê xwe dan Moskovê û li ber deriyê Pûtîn bûn. Li wir lîderê rûs Pûtîn jî bersiva quretiya Erdogan bi pêşwazîkirinê dayê.

Erdogan vegeriya û weke ku li Moskovê bi ser ket, xwe da xuyakirin. Lê ji Moskovê dîmenên perîşaniya wî hatin weşandin.

Piştî wê berê xwe da Brukselê da ku karibe li hember Rûsiya û rêjîmê berhemên şantajên xwe kom bike û alîkariyê ji wan werbigire. Lê destvala ji wir jî vegeriya. Û careke din axivî û zimanê xwe ji bo rêjîm û Rûsyayê hinekî nerm kir. Û daxuyaniyeke bi vî awayî da; "Hêna axa ku ne di destê rêjîmê de ye heye, (Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê meqsed e) hûn çima li Idlibê tacîzan li me dikin.Wir çareser bikin, Idlib hêsan e." Mirov vê daxuyaniyê dikare bi çend aliyan ve şîrove bike. Yek ji wan ew e ku ihtîmal e ku Erdogan bi Esed re li hev bike. Lê xeyalên Erdogan bi lihevkirina bi Esed re naçin serî. Ji ber ku daxwaza lihevkirinê zêdetir a Moskovê ye ne ya Erdogan.

Erdogan bi van daxuyaniyên xwe, careke din dixwaze ku rêjîmê û kurdan bîne beramberî hev û bi hev bide şerkirin. Ji ber ew dizane ku hêza rêjîmê ya li çend eniyan şer bike tune, ew wiha plan dike ku ger rêjîm bi kurdan re şer bike ew ê hêzên xwe ji derdora Heleb û Idlibê bikişîne rojhilatê Firatê. Ha wê demê ji bo Erdogan û deshilata wî û çeteyên HTŞ'ê dibe firsend ku karibin careke din Heleb û Hemayê jî di nav de, gelek deveran bi hêsanî bixin bin kontrola xwe. Ji ber ku xewnên Erdogan ên girtina ji Heleb heta Kerkûkê hîna pêk nehatine. Ji bo wê jî niha li Idlibê ne ku şer rawestiyaye lê belê amadekariya şerekî girantir him ji aliyê rêjîmê û him ji aliyê komên çete û dewleta tirk ve tê kirin.

Birîna xedar; Helebçe

Yaşar Eroglu

Şerê di navbera Îran û Iraqê de gihîştibû merheleyekê. Îran bi ser diket, rewşa Iraqê xirab bû. Hingê giraniya şer li ser sînorê Îran û Iraqê yanî tam di dilê Kurdistanê de pêk dihat. Her du aliyan jî welatê kurdan kiribû qada şer. Ên ku dibûn mexdûrê şer kurd bûn. Îranê ji bo erdê wan dagir bike, Iraqê jî bi hinceta kurd nebin hevkarê Îranê li kurdan dixist.

Çawa ku Ehmedê Xanî di berhema xwe ya şahkar Mem û Zînê de sêsed sal berê dibêje, '…Her mîrekî wan bi bezle Hatem/ Her merekî wan bi remze Rustem/ Bif'kir, ji ereb heta gurcan ve/ Kurmancî ye bûye şubhê bircan/ Ev rom û ecem bi wan hesar in/ Her terefan qebîlê kurmanc/ Bi tîrê qeza kirine amanc/ Guya ku li serhedan kilîd in/ Her taife seddek in, sedîd in/ Ev qulzumê rom û tacîk/ Hindî ku bilivin xurûc û tehrîk/ Kurmanc-i dibin bi xwîn mulettex/ Wan jêkve dikin mîsalê berzex'. Weke ku di dîrokê de jî dibûn hesarên şer, îro jî dibin qada şer. Bi deh hezaran kurd di komkujiya Enfalê de hatine qetilkirin. Heta kurd nebin xwedî statû, weke duh, îro û sibe jî wê ji bûna qada şer xilas nebin.

Çi bû sûc û gunehê kurdan? Ji ber çi vê hovîtiya mezin hat serê wan? Di Rojhilata Navîn de çar dewletên mêtinger bi peymana Qesr-î Şîrîn û Lozanê statuyeke paşverû damezirandine. Di nav sînorên van her çar dewletan de jî bi milyonan kurd cih digirin û ji bo vê statuya paşverû kurd xetere tên dîtin. Nijadperestî, statuparêzî û netewedewletîbûna dewletên faris, ereb û tirkan rê dide komkujiyan ku gelê kurd rû bir û dimîne. Her dewletek kurdan ji bo xwe weke xetereyeke mezin dibîne. Hebûna kurdan ji bo hebûna wan kelemekî tûj tê dîtin. Her yek ji ya din re, ji bo qirkirina kurdan pêşwazî dike. Duh û îro komkujiyên Dêrsim, Zîlan, Cizîr, Nisêbîn, Helebçe, Enfal, Amûdê, Qamişlo, Efrîn, Mehabad, Sinê ji aliyê van dewletên xwînrij ve pêk hatine. Dewletên emperyalîst ên ku di erdnîgariya Rojhilata Navîn de hesab û berjewendiyên wan hene hevkarên van dewletan in û di van komkujiyan de tilî û berpirsiyariya wan heye.

Bi rastî jî Sadam Huseyîn li hember Îranê destek kirin, teşwîq kirin, sîleh û gaz danê, bêdeng man. Kingê ku Sadam Huseyîn li dijî wan derket, wêga komkujiya Helebçeyê bi bîr anîn û Sadam pê darizandin. Yanî ji bo komkujiya kurdan na, ji bo berjewendiyên xwe derxistine rojeva cîhanê. Di vir de samîmiyetek tune ye.

> Di dused salên dawiyê de, kurd ji komkujiyan bêpar namînin. Lê belê komkujiya Geliyê Zîlan, Dêrsim, Helebçe û Şengalê di bîra kurdan de werçerxanên reş in, tu car nayên jibîrkirin. Helebçe êş û birîneke kûr e

Polîtîka û hesabên wan ên li ser Rojhilata Navîn hene ku car heye Helebçeyê û serpêhatiyên kurdan li ser sivreya danên xwarinê radixin.

Di dused salên dawiyê de, kurd ji komkujiyan bêpar namînin. Lê belê komkujiya Geliyê Zîlan, Dêrsim, Helebçe û Şengalê di bîra kurdan de werçerxanên reş in, tu car nayên ji bîrkirin. Helebçe êş û birîneke kûr e. Ji jenosîdên ango nijadkujiyên herî mezin ên cîhanê yek e. Mixabin Neteweyên Yekbûyî (NY) û dewletên serdest ên cîhanê berê ji vê jenosîdê re çavên xwe girtin lê belê paşê mecbûr man li gorî hiqûqa navteweyî jî weke jenosîd-nijadkujî qebûl kirin. Helebçe ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû cîhanê jî nijadkujiyeke herî mezin e. Ne ji samîmiyeta xwe, polîtîkayên demî wisa hewce dikir. Em ji ku derê dizanin? Em ji vê rastiyê dibînin ku Efrîn ew qas nebe jî bi komkujiyeke xedar re rû bi rû ma, hemû ev dewletên navborî û NY ker û lal man. Polîtîkayên wan ên demî îro wisa hewce dikin. Dibe ku siberoj berjewendiyên wan biguherin wêga helwesteke din nîşan bidin.

Îro qetlîam û komkujî tu car şêmîka kurdan dûr nîn in. Ji Geliyê Zîlan, Dêrsim û Helebçeyê vir ve tenê dem guheriye lê feraseta dewletên xwînrêj belkî dirûv diguherîne lê kakilê wê naguhere. Ew tenê hêz û serweriya xwe ya nijadperest difikirin. Qirkirina kurdan ji bo wan tiştekî ji rêzê ye. Ew tenê desthilatdariya xwe dixwazin, kurdan an jî bindestan nafikirin.

Efrîn, Serêkaniyê, Şengal. Grêspî, Kerkûk hê dîrokên taze ne û li ber çavên vê dinyaya ku Neteweyên Yekbûyî û dewletên Rojava yên serwerê polîtîkayên cîhanê û hemû dewletên desthilatdar ên cîhanê ev komkujî qewimîn lê gotineke wan li dijî van hovîtiyan nebû.

Em ê bi dengekî bilind bêjin, bila Helebçeyên din nebin, bila gelê kurd û cîhan bi aştiyê bixemile lê rastiya me ne ew e, aştî û aramiyê ji bo gelê kurd layîq nabînin. Li her parçeyên Kurdistanê dewletên dagirker û nijadperest ji rijandina xwînê re amade ne. Naxwazin kurd bibin xwedî hêz û statu. Kurdan wek kelemên li dijî serdestî û desthilatdariya xwe dibinin. Heta ev feraset û hevkariya dewletên li pişt wan disekinin neguherin xetereya komkujî û qetlîamên li ser kurdan ji ber şêmîka kurdan kêm nabin.

Divê li dijî van polîtîkayên tunekirinê kurd bibin yek, kurd bibin hêz, li her qadên têkoşînê zane bin, bibin pisporên karen xwe, tifaqên berfireh pêk bînin. Ji bo defdana vê xetereyê ev yek xalên bingehîn in.

Sala 88'an adarê bihar gihîştibû çiya û deştên Helebçeyê. Pez û dewarê Helepçeyê li dor çem û mêrgan belav bûbû. Ligel şer, sûk û kolanên Helebçeyê diçilvilîn. Helebçeyê weke her bajarên kurdan xwe ji bo Newrozê amade dikir. Bêhna biharê mirov sermest dikirin û Newroz li ber şêmîka wan bû. Bûk û zavayan roj dabûne cejna Newrozê ku sersalê dewata xwe bikin. Lê balafirên Sadam mirin barandin ser bajarê Helebçeyê. Bêhna biharê çû, bêhna sêvan bû hilma wan. Sûk û kolanên Helebçeyê bi kuştina bêdeng û bêxwîn tije bûn. Jiyan li Helebçeyê biriya, mirin û bêdengî hat. Xeml û destmala bûk zava li erdê ma. Dergûş û dayik bi hev re ketin ser xaka sar. Erê Helebçe kuştin, nehîştin bigihîje Newrozê. Helebçe kuştin, bêwext bû, Newroz bû li pêş wan bû. Helebçe birîneke qaliknegirtî ye, tu car nayê jibîrkirin.

36 sal berê Helebçe wiha derkete rojeva cîhanê. Mixabin îro jî kurd dîsa di nav van dîmenên hov re derbas dibin. Di salvegera sala 36'an de em komkujiya Helepçeyê şermezar dikin, şehîdên Helebçeyê di serî de, em mexdûr û şehîdên komkujiyên kurdan û yên cîhanê tev bi bîr tînin.

Hê xwîn jî vê birînê tê

Harûn Evîndar

Bi qasî xak û dîrokeke bi berhem ewqasî jî bi êş û kul e Kurdistan. Bi qasî gelê leheng û mêrsas e, ewqasî bi birîn û keder e. Çiqasî jina kurd xweragir û qudret e, ewqasî li ser sînga wê ji sûngî û mîxên xayîn û nemerdan tije birîn, hesret û keser e. Em xwedî dîrokeke qedîm û heqîqeteke wisan in, hema bêje tu rojek nîne ku xwedî wate, pîrozî û bi êş û jan nebe.

Ji bo vê ye ku dijminê gelê kurd ê xwînxwar tim ji bo xwîna kurdan bimije û xwe li ser bide jiyîn bi devxwîn û çavsorî êrîş dike, qetil dike û tune dike. Em weke her salê îsal jî ber bi wê rojê tên... Ew roj 16'ê Adara 1988'an Helebeçe ango bi navê xwe yê din 'Enfal' e. Enfal dîrokeke ku tu carî wê neyê jibîrkirin û tim birînek be li ser bedena dayika Kurdistanê ye. Dibêjin birîna ku nekuje qehîm dike, ez jî li ser vê gotinê dixwazim hinek vê birînê vekim û li gorî rewşa heyî bikevim nav mijarê.

Êrîşa yekem a kîmyewî ya Balîsan: Rejîma Baasê cara yekem di 16'ê Nîsana 1987'an de li hemberî Geliyê Balîsayê çekên kîmyewî bi kar anî. Li gorî texmînan 64-142 kes hatin kuştin. Piştre bi sedan kes hatin girtin ku agahiya tu kesê ji vê bûyerê pêk neyê. Di êrîşa Sergelî û Bergeliyê de jî 25 û 30 gund bûn hedefa artêşê. Li gorî çavkaniyên Yekitiya Nîştimanî ya Kurdistan (YNK) di vê êrîş û dorpêçê de ji 200 heta 250 pêşmerge û gundî hatin qetilkirin.

Êrîşa 2'yem a kîmyewî ya Şanexşê: Rejîma Baasê li dijî pêşmergeyên YNK'ê yên li gundê Şanexşê kom bûbûn, çekên kîmyewî bi kar anîn. Piranî pêşmerge 28 kes hatin qetilkirin û 300 kes jî birîndar bûn.

Êrîşa 3'yem a herî xedar Helebçe: Piştî dorpêça li Sergelî-Bergeliyê û şûnde bi piştgiriya pêşmergeyên YNK'ê leşkerên Îranê ketin bajarokê Helebçeyê. Di 16'ê Adarê de artêşa Iraqê bi hewan û topan êrîş bir ser bajarokê Seîd Sadik ê dikeve bakurê Helebçeyê. Ev operasyon bi navê 'Enfal'ê ku weke xenîmetê şerê artêşê tê pênasekirin hat kirin. Di vê operasyona de ku heta 17'ê Adarê dom kir bi dehan bombeyên gaza xerdel û fosforê hatin bikaranîn. Di vê êrîşê de zêdetirî 5 hezar kes hatin qetilkirin û 9 hezar kes jî birîndar bûn.

Êrîşa 4'emîn a kîmyewî ya Karadagê: Rejîma Baasê gund dabûn ber topan û ji topên ku li avahiyan diketin bêhneke 'sêvê' belavî derdorê dibû. Li gorî hejmara ne zelal derdora 78-87 kes hatin qetilkirin.

Êrîşa 5'emîn a kîmyewî ya gundê Ekser: Di 3'yê Gulanê de gundê Ekser bû hedef û li gund gûyek spî û bêhneke pûnkê belav bû. Lê li gorî agahiya kesê bi navê Enwer Riza Omer 25 pêşmerge şehîd bûn, 5 jî birîndar bûn.

Her çendî ku bi awayekî fermî Enfal di sala 1986'an de pêk hatibe jî lê li başûrê Kurdistanê pêvajoya qirkirina kurdan sala 1983'an bi qetilkirina mêrên Barzanî ve dest pê kiriye. Zêdetirî 8 hezar mêr ên Barzanî ku temenê wan li ser 10 saliyê re heman rojê ji malên wan hatin derxistin û çolistanên başûrê Iraqê piranî bi saxî hatin binaxkirin û qetilkirin. Di navbera sala 1986-1989'an de piranî kurd 185 hezar Kurdistanî bi çekên kîmyewî hatin qetilkirin. Her wiha 4 hezar û 665 gund ji van 4 hezar di êrîşa qirkirina Enfalê de hatin xerakirin, hezar û 800 dibistan, 300 nexweşxane, 3 hezar mizgeft û 27 dêr hatin hilweşandin, ji sedî 90'ê gundên kurdan bi erdê re kirin yek.

Nabe ku li vir bendekê ji bo jenosîda Şengalê venekim û derbas bibim. Piştî Helebçeyê, yek ji komkujiyên herî mezin ên li dijî kurdan a 3'yê Tebaxa 2014'an li Şengal li dijî civaka êzidî pêk hatiye. Ev komkujî jî bi qasî Enfalê bi êş û xedar bû. Dema mirov li bîlançoya wê dinêre, wê ji bo vê jî pênaseya 'Enfal'ê ne kêm be. Nêzî 400 hezar kes ji gund û bajarên xwe koçber bûn. 6 hezar û 450 jin, zarok, keç û beşek zilam dîl ketin destê DAIŞ'ê. Li gorî hatî tespîtkirin heta niha ji 6 hezar û 450 kesan 3 hezar û 370 kes ji destê DAIŞ'ê hatiye rizgarkirin. Zêdetirî 3 hezar kes aqûbeta wan hê jî ne diyar e. Hezar û 500 kes ên li dijî DAIŞ'ê li ber xwe dan şehîd bûn. 280 kes dema ku ji ber êrîşên DAIŞ'ê reviyan, di rêyên çiyê de ji têhn-birçîbûn û nexweşiyê jiyana xwe ji dest dan.

Dema mirov li van bûyeran dinêre, dibîne ku çiqasî janeke bêderman e. Ev yek tenê li beşeke pêk hatiye. Li bakurê Kurdistanê Geliyê Zîlan, Geliyê Tiyarê, Dêrsim, Gimgim… her wiha di dîroka nêz de, jêrzemînên Cizîr û Silopiyayê hê zindî ne. Dîsa li Rojava di nav 9 salên dawî de li Kobanî, Cizîr, Efrînê jin û zarok jî di nav de bi sedhezaran kes hatin qetilkirin û ji cih û warên xwe bûn.

Divê gelê kurd dîroka xwe bizanibe. Heta yekitiyek nebe û hevgirtineke di nav mala kurdî de nebe, wê hê zêdetir komkûjî û qirkirin werin serê me kurdan. Ji bo vê, divê demek berî demekê ev birîn bikewin û hew xwîn ji wan biherike û em bikaribin yekitiya neteweyî û kongreya neteweyî pêk bînin. Em hêvî dikin ku yekitiya nav mal kurdî pêk bê. Na ev yek nebe, dê birîn kûrtir bibe. Ev jî ne qedera me kurdan e…

Antrparantez

Pêşar Bextewer

Wendoxê erjayeyî yê rîpelê kirmanckî yê Xwebûnî merheba. Goreyê mi ra, nuştene seba ma mesulîyet o. Aye ra gama ke nê rojnameyî ra embazan mi reyde têkilî rona û waşt ke ez ge-ge bînusa, mi dest de qebul kerd. La seke mi înan ra zî va hetanî ke îmkan bibo û wext estbo ez wazena aşme ra reyê nê goşeyî binusa. Eke şîma pers bikê û vajê "Baş o, ma ti do tede çî binusî?" Ez eşkena cewabê şima wina bida: Çîyê/qewimîyayîşê ke kurdan, bi taybetî kirmancan ra eleqeder ê, (sey tarîx, cuye, huner, muzîk, sînema, folklor, akademî, ûsn. la bê sîyasetî) înan mîyan ra çîyê ke kewênê çimanê/kewtî çimanê mi ver ser o vindera. Destpêkê nuşteyê xo hîna vêşî derg nêkera û derbazê babetanê xo biba.

Keko, Kormişkan û Ne Fîl o Ne gergedan o…

Ma Başûrî teber a biverdê, bêstatuyîya kurdan ra girêdayê yew kêmaneya ma zî arşîv ê. Oxro ke arşîvî xafizaya yew netewe ya. Heyf ke merdim eşkeno vajo xafizaya neteweya kurdan zî natemam a. Sey nimûneyî ma qalê kovar û rojnameyanê kurdan yê ke seserra 20. de ameyê vetene bikê. Çend kovar û rojnameyî estê ke yan temamê înan yan zî çend hûmarê înan nêresayê ma dest. Eke arşîvê ma estbîyêne wina bîyêne? Helbet ke nêbîyêne.

Mi cor ra wina dest bi babeta xoya yewine kerd çunke wa o hîrêyin na game vindero, di çekuyê verênî yê ke sernuşteyî de ca girewtê, nameyê di kovaranê kurdan ê. Û eke ez şaş nêba nê di kovarî hetanî ewro nêamebîy vînayene. Ez bi xo nê kovaran ra reya verêne bi sayeyê kitabê Li Kurdistana Bakur û Li Tirkiye Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992) yê Malmîsanij û Mahmûd Lewendîyî hayîdar bibîya. Nê kitabî de sey gelek kovaran û rojnameyan derheqê nê kovaran de zî tayê melumatî ameyêne dayene. La mi ê qet nêdîbîy. Çend rojî verî Swîs ra wayîr û îdarekarê **www.arsivakurd.comî** birêz Rifat Sefaliyî mi gêra û mizgînîya vînayîşê xo yê nê kovaran daye mi. Dima mi rê her di zî bi şeklo dîjîtal erşawitî. No mîyan de bê ke xo vîr ra bika ez vaja: Demeyêkê nêzdî de ê do eynî keyepelî ra bêrê weşanayene û bi no hewa kesê ke biwazê înan biwanê do bieşkê uca ra biwanê û bîyarê war. Baş o ke merdim heqî wayîrê/anê heqî rê teslîm bikero. Rast a zî xizmetê **arşîvakurd.comî** zaf erjaye yo. Bi sayeyê nê organîzasyonî kurdî her cayê dinya ra eşkenê xo biresnê bi hezaran çimeyan û perîyodîkan. Ez nameyê xo ser o vana wa keyeyê Rifat Sefaliyî û embazanê ey awan bo.

Helbet ez pê na xebere keyfweş bîya. Çunke seke mi cor ra zî vatbî ê hetanî ewro nêamebîy dîyayene no yew. O dîyin zî herçiqas bi tirkî vejîyê zî seba ke hetê ciwananê wendekaran yê kurdan yê ê demî ra ameyê weşanayene, tede ekonomî ra hetanî sosyolojî zaf hetan ra atmosferê ê serran yeno fehmkerdene û xususen zî fealîyet, fikirîyayîş û tenaquzanê tebaqaya roşnvîranê kurdan yê (kurmancan û kirmancan] sewregijan yê serranê 1960î ser o zanayîşan danê ma, ehemîyetê nê kovaran esto.

Taybetîya înan a hempare na ya: Her di zî hetê wendekaranê unîversîteyan yê sewregijan ra, Anqara de û serranê 1960î de ameyê weşanayene. Her di kovarî zî bi tirkî weşanîyayê. Kekoyî de zaf-zaf tay metnê kurdkî (kurmanckî û qismen kirmanckî) zî ca gênê. Bêguman merdim ke şertanê ê serran bîyaro xo vîrî fehm bikero ke ê wextan tena çend çekuyanê kurdkî nuştene bîle zehmet bîyo û hetê tesîrî ra zî sey çîyêko mucîzewî asayo.

Kovara Keko serra 1963yî de Kormişkan zî serra 1965î de ameyê weşanayene. Ma bêrê çekuya hîreyinê ya sernuşteyê mi yanî **Ne Fîl o Ne gergedan o…** ser. Rîpelê 13. yê kovara Kekoyî de bi sernuşteyê Fikralar (Fiqreyî) di fiqreyê bê nameyî ca gênê. Her di zî hetê Abbas Îzolî ra û bi tirkî nusîyayê, la ê dîyinî de bi hawayo qismî bo zî bi kirmanckî zî nusîyayo. Ez eynî sey şeklê orîjînî neqlê cêrî kena:

İki Siverekli çarşıda gezerlerken bir sebzeci dükkanı önünde durmuşlar.

Çok büyük bir patlıcanı göstererek birbirlerine sormuşlar.

No çiçyo? (Bu nedir).

Biri demiş!

— La no filo (bu fildir).

Diğeri ise:

- Nila gergedano (yok gergedandır) demiş.

Filo, gergedano diye aralarında münakaşa çıkmış. Meseleyi halletmek

için muhtara gitmişler. Muhtar gelmiş bakmış ve demiş ki:

No ne filo, ne gergedano, gılgıl verdo bıpey merdo.

(Bu ne fildir ne gergedan, darı yemiş ve onunla ölmüş).

KEKÔ

KÎRMIŞKÂN

İki Siverekli çarşıda gezerlerken bir sebzeci dükkânı önünde durmuşlar. Çok büyük bir patlıcanı göstererek birbirlerine sormuşlar.
— Nu çıçyo? (Bu nedir).
Biri demiş!
— La no filo (bu fildir).
Diğeri ise:
— Nila gergedano (yok gergedandır) demiş.
Filo, gergedano diye aralarında münakaşa çıkmış. Meseleyi halletmek için muhtara gitmişler. Muhtar gelmiş bakmış ve demiş ki:
No ne filo, ne gergedano, gılgıl verdo bıpey merdo.
(Bu ne fildir ne gergedan, darı yemiş ve onunla ölmüş).

Abbas İZOL
İktisadi ve Ticari İlimler Akademisi

Seke şima zî zanê na meselaya kilme mîyanê kirmancan de zaf namdar a û çend varyantê aye estê. La çîyo muhîm no yo ke reya verêne na kovare de nusîyaya. Eke ma na mesela ya ke metnêkê tirkî mîyan de vîyarena û tena şeş cumleyan teşkîl bena sey metnêkê kirmanckî bihesibnê ma eşkenê vajê ke rojnameyê Roja Neweyî ke eynî serre (1963) vejîyo ra pey çimeyo dîyîno ke tede bi kirmanckî nusîyayo kovara Keko yo.

Herr Greve Kirmanckî Museno

Şima surete Martîn Greveyî nê rîpelî ra vînenê. O bi xo yew alman o. Herr zî seke şima zî zanê almankî de yeno manaya begî û almanî gama ke yewî rê bivajê Beg peynameyê ey xebitnenê. Sernuşte bi xo semedê babeta mi bîyayena ey dîyar keno. Ya, şima rast fehm kerd. O yew alman o û kirmanckî museno. Martîn her hewte roja şemeyî Mutlu Canî ra bi dersa taybete û rî bi rî dersa kirmanckî gêno. Ez şima nêzana la mi rê no tercîhê ey balkêş ame. Martîn seba ke kirmanckî bimuso lebate keno, bi hawayo îstîqrar dersan gêno, waneno û xebitîno. Bi mi no waştiş û seba nê waştişî lebitîyayena ey biqîymet o. Xora coka mi waşt ke ez qalê ey bika. Şima zî ey ra hayîdar bibê. Ha, naye zî vaja: Martîn seba dersanê taybetan yê kirmanckî ucreto saatane zî dano…

Êdî her çî googleyî ser ra yeno musayene. Bêguman şima ra kes ke meraq biko eşkeno bîyografîya ey biwano, derheqê ey de hîna zêde agahîya bigîro. Aye ra tîya de ez derheqê Martîn Greve de nînan vaja bes o. Martîn Greve akademîsyen o, etnomuzîkolog o. Yewendes serrî yo ke Tirkîya (Îstanbul) de ciwîyeno. No mabên de tîrkîya ey zî qet fena nîya. O, folklorê Dêrsimî yê fekkî reyde xususen zî kilamanê/deyîran û sanikanê Dêrsîmî reyde eleqedar o. Hetta ey demêke nêzdî de kitabê Dêrsim Masallari [Sanikê Dêrsimî] yê Caner Canerîkî tirkî ra açarnayo al-

Martin Greve

mankî ser.

Mi va Martîn kirmanckî museno la destpêkê kirmanckî musayîşê ey bi nê dersanê taybetan yê ke Canî ra gêno ra ver o. Goreyê îfadeyê ey Martîn Greve, reya verêne Berlîn de seba ke bieşko embazanê xo yê gimgimijan û dêrsimijan reyde bi ziwanê înan qisey bikero dest bi musayîşê kirmanckî kerdo.

Axir ez se vaja? Yew beyaxkî (xerîb) hem zî seba ke embazanê xo yê kirmancan reyde bi ziwanê înan qisey bikero dest bi musayîşê kirmanckî bikero. Bi serran ra nata musayîşê xo bidomno, çend rey beşdarê kursan bibo, xo bi xo bixebitîyo... Nika zî semedo ke xo hîna aver bero, pere bido û dersanê taybetan bigîro. Ma, şarê ma? Şarê ma zî kirmanckîya xo ra fek veradayo, seke çîyêko normal bo bi tirkî ciwîyeno, muteberê ma nakaratê UNESCOyî tekrar kenê. Tayê hunermendê ma zî seba ke "kirmancî/zayayî vateyanê kilaman/deyîranê kirmanckîyan fehm bikerê" klîbanê xo bi cêrnusanê tirkîyan virazenê… Xulasa ez vana to rê helal bo Martîn beg û Danke schön! Xeyalê mi no yo ke kirmancê ke sayeyê nê goşeyî de to ra hayîdar bîyî wa rojê raştê yew nuşteyê to yê kirmanckî yan zî deyîrêka kirmanckîya ke bi destê to nusîyaya bêrê.



Pêşnîyaznameː Kovara Zîryabî rê

Ez vana qey şima kovara Zîryabî ra hayîdar ê. Zîryab serê 2018î ra nata sey kovara muzîkî weşan keno. Kovare çar aşman ra reyê vejîna. Hewceyîya kovarêka winasîye esbî, aye ra ez vana wa dest û payê ê kesan yê ke na xebate kene weş bê. Kovare de kirmanckî zî ca vînena, no zî çîyêko baş o helbet. Hêvî kena ke weşanê ey bi serran dewam bikero.

Peşnîyaza mina yewine do kadroyê Zîrayabî rê bera. Ez vana mîyanê înan ra keso/a ke Gomidas' (Vartabed) nas nêkero/a çin bo/ba. Hîkayeya nê etnomuzîkolog û arêdayoxê namdarî ya trajîke tîya de babeta mi nîya. La seke yeno zanayîş Gomîdas Vartabed (Soğomon Soğomonyan) tena seba armenîyan ney, tarîxê folklornasî û xususen tarîxê arêdayoxîya muzîkê anonîmî yê tirkan û kurdan zî ehemîyetêko pîl îfade keno. Ey, kîşta deyîranê armenîkî û tirkî de epey deyîrê/kilamê kurdkî zî arêdayê. Sey yew nimûneyî: Gomîdasî, deyîrê ke Arekerdeyanê Sarkîs Haygunî yê bi nameyê Destanê Armenîyan û Kurdan de ca girewtê transkrîbe kerdê. No kitabo broşur reya verêne 1903 de Moskova'da bi nameyê "Melodîyê Kurdan" ameyo weşanayene. Deyîrê nê çimeyî "aredayeyê kurdkî yê tewr verênî ke ameyê notakerdiş" yenê qebulkerdene. Bi mi ganî kurdî bieşkê derheqê Gomîdasî de hîna zaf agahîyan kovara Zîryabî ra biwanê. Hem Gomîdas hem qedîrşinasîya ey a derheqê folklorê kurdan de yê verê seserre rîpelanê Zîryabî de ci ra qalbîyayîşi zaf-zaf heq keno.

E-kovara Kubarî rê

Çi weş ke êdî kovara moda ya kurdkî zî esta. Bravo vetoxan rê! Ya, ez behsê e-kovara Kubarî kena. (Kesê ke wazenê biwanê rê: kubarkovar.wordpress.com) Ez parçeyanê bînan nêzana la seke xeberê ke derheqê aye de amade bîye de zî vîyareno "Kubar kovara moda ya tewr verên a ke hetê kurdan ra û bi kurdkî yena vetene. La Kubar seranser bi kurmanckî ya. Ganî tede tay bo zî cayê kirmanckî estbo, no yew. O dîyin zî no yo: Ma zanê ke çi Tirkîya çi Ewropa de stîlîstê (modelistê) kurdî yê serkewteyî estê. Ganî Kubar înan reyde roportajan bikero û xêzanê înan bi kurdan bido şinasnayîş. Ha, no mîyan de mi va xêzanê înan ame mi vîr (ez tîya huyaya) Edîtorê Kubarî ganî naye ser o zî vinderê; Raşt, na neweşîya îşlîgan, çaketan, pantoran û qatlîxanê xêzeyinan (çîzgîlîyan) xora dayena camêrdanê kurdan do se biba?



Ka binêrin bê kî dîn e?

Simaîlê dîn, li binxetê dînekî bi nav û deng bû, ew bi xwe ji bajarê Amûdê bû. Karê wî li gundên di navbera Qamişlo û Amûdê de digeriya û her carê tiştek difirot. Mesela wî ji firotina tiştan bêtir mijûlkirin bû. Carnan rojekê du rojan bi mêvandarî li malekê dima.

Dema ew dihat gundê me li mala pîra Hilwa dima. Kurekî pîra Hilwa hebû gelekî bela xwe di Simaîlê dîn dida. Rojekê Smaîl gelekî jê aciz bû û ji Hilwa re got: Keçê Hilwa niha ev kurê te Şêxmûso bi sorka ketibû? Hilwa got erê. Smaîl got: Ma bi mîrkotan jî ketibo? Hilwa dîsa got erê. Smaîl got: Ma şêxmûso bi xuriyê jî ketibû? Dîsa Hilwa got erê. Simaîlo got: Keçê Hilwa ma îca ez ê çi nifirê li Şêxmûso bikim, bi xwedê ez çi bêjim vala ye madem ewqas nexweşî nikaribûn bi Şêxmûso êdî ez çi bêjim vala ye.

Smaîlo li gundan digeriya şekir, nok û benîşt difirotin hem bi pera û hem jî bi hêkan tiştên xwe difirotin. Carekê selka di destê wî de tijî hêk bûbûn. Mirovek hat û bazara hêkan pê re kir.

Xalê Smaîl tu heba hêkan bi çi difiroşî?

Simaîl: Her hêkek bi çar firingan e.

Mêrik: Xalê Simaîl, tu her hêkek bi 3 firingan bidî min ez ê tevan li ser hev bikirim.

Simaîl: Bi xeyd lê vegerand û got: Kuro lawo ma tu dînî heke ez hêkên xwe tevan bifiroşim te, êdî ez ê tîcareta çi bikim û ez ê çawa ji xwe re li gundên din bigerim.

Careke din jî Simaîlê dîn kerê biribû qiraxa çemê Amûdê ji bo biçêre. Çend ciwan jî li wê derê rûniştibûn xwarin dixwarin, meya xwe vedixwarin û kêfa xwe ya hatina biharê dikirin. Yekî ji wan ciwanan bang li Simaîlê dîn kir û got: Xalê Smaîl wer ba me tu jî bi me re qedehekê vexwe. Smaîlê dîn ji ciwanan re got: Kuro lawo hûn vedixwin ji bo hûn bibin wek min ma ez vexwim ez ê bibim weke kê.

Dildarê Amedê

XACEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Beşa di navbera serî û sînga mirov de. 2. Xwişka mezin. 3. Beramberî hev kirin, rûbirû. 4. Alavekî cotkariyê ye, didin ser stûyê ga û pê cot tê kirin. 5. Bi şûn de hatin. 9. Bi zaravayê kirdkî/dimilî 'were'. 11. Ajalekî/e dirinde û hov. 12. Zerzewateke ku koka wê tê xwarin û tehma wê şîrîn e. 13. Xebat, îş. 15. Wek, nola. 18. Dîn, bawerî. 19. Kesê hêmin, sekan, îqna. 20. Roja beriya duh. 21. Şikilê ku ber, firehî û bilindahiya wî heye.

JI JOR BER BI JÊR

1. Gotin, galegal, axaftin. 3. Xwarineke ku mêş çêdikin. 6. Heb, lib. 7. Cihê ku mirov, makîne û sewal tê de diçin û tên. 8. Gotina ne rast, derew. 10. Pêşgira lêkerçêker. 11. Di navbera du çiyayan de rêya teng û dirêj. 14. Cînavka kesê/a sêyem ê/a yekjimar. 15. Ajalekî/e xîjok û dirinde ye û lingên wî/ê nîn in. 16. Serçavê mirov. 17. Wesleyê ji qolincê heta dest, mil. 18. Dengê ku li mirov vedigere. 20. Ling, wesleyê ku candar pê dimeşin. 21. Hestiyê serî. 23. Dîndar, kesê/a bawermend. 25. Tevahiya bedenê.

Bersiva hefteya borî

Ronahiya Rojê



Berfîn Dijle

Keçelê guriyê gemarî

Hebe nebe, dilê wî heye navenda çandina por, li Amedê veke!

Meriv nizane; kî aboriya xwe bi çi awayî bi dest dixîne û reklama karê xwe yê nû jî bi çi awayî dike!

Her ku destên wî ji kar kiribûn, çavê xwe li karekî nû yê domdar digerand. Reben ez im, xaniyê wî jî bi kirê bû. Hibir li pênûsê çikandibû; lê dîsa jî kiribû nekiribû kuleka wî, dû negirtibû...

Kes naxwîne xwedê jê razî, kes naxwîne! Her kes dinivîsîne. Wext namîne ji xwendinê re. Tu nirxek bi xwendin û nivîsê ve nehiştine. Ê dixwînin ya bêkar in ya jî ên qevd bi girêdan in

Ne bi tirkî ne jî bi kurdî, êdî nivîsên kesî bi pere nakin. Ji bilî nivîsên melayê cîranê me yê xerzî.

Melayê cîranê me niviştvan e. Ji bo dildaran niviştan çêdike. Jin û mêrên cihê li hev tîne. Ên li cem hev jî diqetîne. Ê wî êdî ne pênûs e, şûr e. Derd û xeman ji kokê da dibirîne. Û perê ku ji niviştan bi dest dixe, xwediyê pirtûka xelata wêjeya nobelê jî bi dest naxîne.

Wan rojan, dinya bi berf û şepe bû. Li ser nivîsê; pişta wî xûz, çokên wî ragirtibûn. Nikaribû ji ber tifikê rabe here ser sefikê. Porê wî dirêj û gur lê bi dahfên spî bû. Xwe dabû ser qenepa ber şibakê û kûr û dûr ponijîbû:

"Çi bikim çi nekim, ez ê çawa ji bin barê van deyn û xercan derkevim?"

Ji mêj ve gotibû: "Qinyata min, bi kaxiz û niviştan nayê, ev yek. A din jî; qedera, xweda li jor nekiribe, bi kaxiz û niviştên şêx û melan naçe serî!

Êdî nabe, kumikek spî bide serê xwe û li ber misfehekê jî rûnê. Ji xwe ew ê gulişkên porê wî di bin kumik de daketina ser cênîkên wî. Û heye; wan jinên ji niviştan bawer dikin, qîma xwe bi porê wî bînin, lê bi niviştên wî neynin jî.

Roj bi ser rojan, hej li bin bajaran û vîrusa koronayê ji rişk û spiyan bigire heta bi gur û roviyan jî ket, lê hê hefteyek bi ser neket, yekî di rengûrûyê Jul Birayn de û dîsa wekî wî wêrek, navê wî da û lê kir rexneyek!

Xwedê da porgulîşkê me û di bin rexneyên wî de nema, şev û rojek. Bi sê çar peyvan keysê lê anî û jê re got: "Keçelê guriyê gemarî ! " Bi kevnebiwêjek.

De keçel, ne yek in ne dudo ne. Not û neh (,) nehsed û not û neh ji sedî, (Ji ber gulîşkên porê wî, hejmar nagîje sedî) nake têrî vegotina hejmara keçelên vî welatî. Hin irsî hin jî ji ber kul û xemên dinyevî!

Lehiya kul û xeman, li kevçîka dilê gelê me rabûye. Hêvî, li ser baskên qaqlîbazên peravên behra dil bin jî; porê şirtînî û lawazokî, li serê xwediyê xwe nesekinîn!

Piştî rexne û bersivan, niha hemû keçel telefonî navendên çanda poran dikin. Ji bo nekevin devê porgulîşkên ku; xwedê bişirînek şîrîn jî para wan nexistiye û heye ku porê wan jî bûbin kewara rişk û spiyan.

Heke; te, navenda çanda por venekiribe an nebûbî şîrîkê wan; de ka çima dev davêjî keçel û guriyan?

Ne, kalê min jî keçel bû. Di qileqija çilê havîna navîn de jî; tu car kum û şewqe ji sere wî kêm nedibû. Şirikên xwêdanê di bin kum de davêtin rûyê wî. Heke sax bûna, ew ê bigotina: Selîmo lawo! Qey tu bîrekor î? Çawa, halê keçelan bîr nabî? Bi Şêx Hadîkê Melekê Tawis kim, tu ji destê min xelas nabî!

Ziman û ruhê wergerê

Aryan Med

Wergera ji zimanekî bo zimanekî din, yek ji rêbazên danûstandinê yên di navbera çand, huner, wêje û zanistê de ye. Dikarin bêjin ku werger, ji destpêka bikaranîna nivîsê heta roja me ya îro, parçeyekî girîng ê şaristaniyê ye.

Tabletên Sumeran wek wergera destpêkê tên binavkirin û bi rêya wergera ji zimanê sumerî em zanyariyên pir girîng bi dest dixin. Pirtûkên olî bi rêya wergerê di nav gelan de belav bûne.

Di serdema me de ku teknolojî pir li pêş e, bêyî ku li çapxaneyan bê çapkirin, bi rêya înternetê tavilê zimanek li zimanekî din tê wergerandin û ew berhem tê belavkirin. Ev jî dike ku her kes dikaribe xwe bigihîne zanyariyên bi zimanekî din.

Werger, ji bo zimanên di bin nîrê mêtigeriyê de tên asîmilekirin pir girîng e. Ji ber ku deriyê zanyariyê li van zimanan bi kotekî hatiye girtin, ji berhemên cîhanê jî bêpar mane û ji neçarî fêrî zimanên serdestan bûne. Zimanê kurdî jî yek ji van zimanan e ku sedan sal in ji aliyê desthilatên ereb, faris û tirk ve tê asîmilekirin. Ji lewra rol û rista wergerê bo pêşketin û berdewmiya hebûna zimanê kurdî hêmaneke diyarker e.

Li Wêjegeh Amedê ya destpêka sibata 2020'an, bi armanca birêvebirina kar û barên çand û wêjeya duzimanî (kurdî-tirkî) hat vekirin, di çarçoveya rêzeçalakiyên navendê de, bi sernavê 'Ruhê Wergerê' bi pêşkêşiya nivîskar û wergêr Dilawer Zeraq, guftûgo hat kirin.

Zeraq têkildarî kartêkerî û girîngiya wergera kurdî gotarek pêşkêş kir. Li gorî wî, ji bo wergerê duzimanî bi serê xwe têr nake. Her wiha tîne ziman ku wate û fêmkirina wergerê cihê xwe baş negirtiye û dibêje: "Em radibin li ser vê zanînê hewl didin ku metnekê çi edebî, çi zanistî binîn ser zimanekî din. Her kesên du milên wan hene dikarin kemanê bijenin? Na!"

Zeraq der barê destpêkirina duzimaniya kurdan û wergera kurdî de jî zanyariyên balkêş parve dike. Di gotarê de diyar dike ku duzimaniya kurdan bi îslamiyetê dest pê dike û medrese ne bi destê kurdan, bi destê ereban hatine avakirin.

Bi taybetî di serdema xelîfeyê îslamê Hz. Omer de bi armanca perwerdeya bi erebî du tiştên sereke tên kirin: 1. Avakirina medreseyan, 2. Qedexekirina ayetên quranê. Bi van pêngavên girîng, erebî li kurdan tê ferzkirin.

Zeraq, destnîşan dike ku lêkolîner dibêjijn ku di medreseyan de metnên erebî li kurdî hatine wegerandin û wergera kurdî ya ji zimanekî din dikeve jiyana kurdan û wiha tîne ziman: "Ji wê çaxê ve ye em bi wergerê dijîn. Ruhê me werger e. Derbek li ziman û ruhê me yê esasî, ruhê me yê binelî, xwemalî ketiye. Heta wê çaxê bi kurdî çi çêbûbe, em hîn jî wan bi kar tînin."

Bi dîtina Zeraq heta Melayê Cizîrî tu kes li hember ruhê wergeriyê serî ranake û dibêje ku Cizîrî dixwaze vê yekê berevajî bike. Cizîrî wek serhildêrekî li hember zimanên serdest bi nav dike û tîne ziman ku Cizîrî, bi nivîsandina bi kurdî li dijî

erebî û farisî û her wiha desthilatiya Osmaniyan derdikeve.

Zeraq amaje pê dike ku tu nivîsên kurdî yên heta niha hatine nivîsîn ji sedî sed ne kurdî ne û sedema vê jî wiha rave dike: "Me agahiyên xwe yên derheqê edebiyat, zanîn, teknîk û teoriyê de ji zimanekî din hildane. Em van agahiyan pêşî di hişê xwe de werdigerînin zimanê xwe û di heman demê de werdigerînin ser ruhê xwe. Agahiyên zanyarî, zanistî, teoriya sosyolojiyê, felsefeyê, psîkolojiyê di ruhê zimanê min de tune ne. Ji xeynî dermanên kurmancî tu agahiyên tibê, teknolojiyê di destê me de tune ne. Sedema vêya polîtîkaya yekagahîkirina serdestan a bi zimanên xwe ye."

Nivîskar Zeraq wergerê wek xweheyîkirin û dandiyarkirina kurdan bi nav dike. Her hiwa dibêje ku kurd bi piranî agahiyên xwe ji zimanê tirkî werdigirin û li gorî wî ev kuştina ziman û ruhê kurdî ye. Ziman ku heger haya kurdan ji kuştina ruhê wan hebe, du rê li ber wan hene; an ew ê wî ruhê ku hatiye kuştin bihêlin bila mirar bibe û ew ê li xwe neban bibin, çand û zimanê wan bibe tiştekî fantastîk, fantazmeke genî; an jî ew ê li xwe vegerin hevdû hişyar bikin da ku belkî werin ser hişê xwe.

Zeraq pirsa gelo em ê çawa dikaribin fikreke felsefîk, analîzeke polîtîk, dîtineke psîkanalîtîk bi vî zimanî biafirînin dike û wiha bersivê dide: "Divê em wergerînin da ku li hember serdestan rabûneke antîkolonyal pêk bînin. Em polîtîzasyon, sosyalîzasyon û danûstandina mirovane ku tê de ruhê min dihewe, bi kurdî ava bikin ku ev rabûn û pêkanînên antîkolonyal in."

Zeraq diyar dike ku lêvegerîneke bi hişmendî û li ser zimanê xwe pêwîst e ku ev jî durehî, melezî ye û mînaka 3 qonaxên Hegel ên di vê der barê de tîne ziman: "Kesê/a dixwaze li xwe vegere, divê tehma lixwenebanbûnê (biyanbûn) jî bijî. Hegel li ser lixwevegerîn û nebanbûnê 3 qonaxan diyar dike:1. Kesek pêşî hay ji nebanbûna ruhê xwe dibe; 2. Piştre vedikişe kozika xwe; 3. Paşê jî bi ruhê xwe aciz dibe û hewl dide vegere ser ruhê xwe yê esasî (praksîs)."

Herî dawî Zeraq destnîşan dike ku hebûna ziman û ruhê kurdî girêdayî vegera li xwe ye û kurd ancax bi vî awayî dikarin praksîsa xwe pêk bînin. Her wiha diyar dike ku divê heta ji kurdan tê bi kurdî bixwînin, biaxivin û êdî dem hatiye ku kurd Sokratesî û lînguîstîka Chomsky dikaribin bi kurdî jî bixwînin.

Weswese 2

Dayê ma ez hov bûm?

Şener Ozmen

Adaptasyona Geziyê

Bêsiûdiya herî mezin a 13'emîn Bînala Stenbolê (*Dayê ma ez hov im?*) ya ku di navbera 14'ê Îlon'ê-20'ê Kewçêra sala 2013'an de, bi kuratoriya Fulya Erdemciyê pêk hatibû, *Berxwedana Geziyê* bû, çi ku berxwedanê, ne bi tenê nexşerêya Erdemciyê, di heman demê de deprojeyên gelek hunermendên ku ji welatên dereke bo bînalê hatibûne vexwendin, bi carekê re nebe jî, peyapeya veguherandibû. 13'emîn Bînale Stenbolê, weke adapasyoneke pêwîst a ji rewşeke neasayî –û nepayîn–zayî, bi dû qirçeqirça havîneke çalak derketibû pêşberî xwazgîniyên xwe. Digel ku bînal (li gorî ku Erdemciyê di kataloga bînalê de dûvedirêj digot)[1] , berî Geziyê hatibû vesazkirin jî, kar û bar û projeyên ku hîkariyê ji sirûşa (îlhama) estetîka 'berxwedêr' a Geziyê girtî, tev li bînalê bûbûn. Bo mînak; pîşekar û hunermendê têgehî yê alman *Christoph Schäfer* yek ji wan hunermendan bû yê ku berhema xwe li ser Geziyê afirandibû (*Park Fiction is Now Gezi Park Hamburg, June 16, 2013*). Referansênberhema Jirî Kovandaku yek ji pêşewayên hunera têgehî (*conceptual art*) a Çekî bû, dîsan berxwedana Geziyê bû. Her weha, hunermendên wek *Maya Ersan & Jaimie Robson* jî, qala gotina serokwezîrê wê hingê dikir ê ku ji bo berxwedêran gotibû, "*Oyuna gelme!*", li ser vê yekê Maya Ersan & Jaimie Robsonnavê berhema xwe berevajî vê gotinê danîbûn û hezkiriyên hunerê keremî lîstikê (dek û dolaban) kiribûn.

Nasnav di Geziyê de

Divêt vebibêjim wekî xwendinên kuratora bînalê yên di der barê çalakiyên Geziyê de, siyaseteke ku xwe derî nasnavê dida der, destnîşan dikirin, pê re jî bîr û boçûnên ramanwerê fransî *Jacques Rancière*, yê ku li ser kêş û vekêşên nasnavên wek "negengazî" û "di navberê de mayî"dixebitî. Bi hizra Erdemciyê û gelekên ku wekî wê difikirîn, bi berxwedana Geziyê re, qadeke azadiyê vebûbû ku bi dû xwe re çalakiyine afirîner û forûmên gelemperî jî anîbûn. Yekem car, piştî forûmeke li Parka Cîhangîrê, em ji bo *Medenî Yildirimê* ku li Licê hatibû kuştin, bi kevnekuratorên bînalê û hunermendên tirk re mil bi mil meşiyabûn, ev çalakî di henga meşê de jî bi min xerîb hatibû, ez bi şik bûm, nediket bin kûmê min wekî yên di milê min de dilhebîn bin ku hingê ez jî vexwendiyeke bînala navborî bûm.

Derûdorên hunerî –xasma jî yên li Ewropayê– wekî dibêjin ketibûn etriya Konstantînapolîsa piştî Geziyê. Bînal Gezî bixwe bû, pêk hatibû jixwe! Her çendî ku Erdemcî ji nav cîhana hunerê, dengên qewîn yên weke *Agnieszka Polska, Annika Eriksson, Héctor Zamora, Hito Steyerl, Santiago Sierrayî* vexwendî bînala xwe kiribe jî, manîfestoya sîtûasyonîst a hunera hevçax di qadên pevçûn û berxwedanê yên bajêr de, jixweber hatibû belavkirin ku di çand û hunera îroyîn de kêş û vekêşên sereke jî, jixweberî û fetisîna wê ya di nav dam û dezgehên finansê û sektorê de bû.

Ber bi Civaka Pêşandeyê ve

Bêguman, Gezî ne raperîneke hunerî bû, ne jî çandeyî û weke ku *Duna Maver* jî di nivîsa xwe ya bi sernavê 'Avangarda Terorê' de (*The Avant-Garde Of Terror)* behs ji vê yekê dikir, endîşeya 'Civaka Pêşandeyê' (*La Societe du Spectacle*) ya *Guy Debordî*, dê bi terorê ya ku *Robespierre* di henga *Şoreşa Fransî* de destnîşan kiribû, rabûya. Robespierre yê ku gotibû: "Ji bo rizgarkirin û avakirina demokrasiyê û ji bo pêkanîna desthilata zagonên makeqanûniyê ya mişt aramî, teror pêdiviyek e." Dîsan, her çendî ku cihêbûna *Sîtûasyonîzma Enternasyonal* –ku wek SE tête zanîn– ya di sala 1972'yan de pêkhatî, fena têkçûyina mîlîtaniya polîtîk û arezûya tûndrê (radîkal) hatibe bi lêv kirin jî, SE avangarta dawîn bû. Badilhewa nîn bû wekî peyva avangartê (*avantgarde*), ji ferhenga leşkeriyê hatibû girtin. Lêbelê, wekî ku di Berxwedana Geziyê de jî derketibû mexderê; di nav kom û komikên hunerê –û helbestê de– etîketên weke *medyaya taktîk, gerîlayê/a ragihandinê, zordana çandeyî* û *terorîzma estetîk* di devan de bûbû benîşt.

Çi bi arezûya manîfestolêkirinê hat!?

Bi min, tişta jidestçûyî, ne bi tenê arezûya manîfestolêkirinê bû, arezû bixwe çûbû, weke ku *Guy Debord* jî digot, civak –li vir a Geziyê– dîsan vegeriyabû kodên xwe yên berîn. Dikarim bibêjim wekî hunera îroyîn, her bi çi rengî û bi çi awayî bê kirin jî, xwe di ser aboriyeke dijarezûyê dide der û digere, bêyî ku rêka xwe bi heqîqetê ve jî bixe.

Û 'Hîtoya me'…

Di 13'emîn Bînala Stenbolê de, belê, berhemek hebû ku ji hemû berhemên di wê pêşengehê de cîgirtî, balkêştir û dilşewattir bû, ya Hîto Steyerla ku wek nivîskar û derhênereke dokumentarîst ranêzîkî jiyanê û diyardeyan dibû dihat penasekirin. Hîto, di çarçoveya bînalê de, vîdeoya xwe ya ku li pey şopa hevala xwe Andreayê (Andrea Wolf û heval û hogirên wê yên şervan) ketibû ya ku di şer û pevçûnekê de (li Wanê) jiyana xwe ji dest dabû, nîşan dabû. Axir, heya bi wir jî çûbû Hîto, di wê serdana xwe ya mêjûyî de rastî qewanekî fişekan hatibû, ku ji wî qewanî, bo mînak heya bi *General Dynamics* a ku çek û posat çêdikirin û dezgeheke hunerî ya bi navê *Art Institute of Chicagoyê* ku danûstandinek di navbera wan de pêk hatibû, rob bi ro rê birrîbû. Pirsa Hîtoyê ev bû; *"Gelo di navbera piştgirên Bînala Stembolê û aboriya ku çek û posat çêdikirin de hêzeke veşarî ya danûstandinê hebû yan na? Aya mirov dişiya wekî li ser têkiliyeke amêrkirî* (instrumentalise) *ya di navbera huner û çekê de peyda bûbû, bifikire?"* (Ji Rêbera Bînalê)

Ne dûr e wekî hunermendên me jî hogirî vê amêrkirinê bibin, ya ku hemû karesatên kurdan di ser 'navneteweyîbûnê' re û bi piştgiriya dam û dezgehên hunerê yên kûreyî, bixin mazatê, çi ku huner, ne qadeke paqij e.

[1]Dayê ma ez hov im? Bnr.Rêbera 13. Bînala Stembolê, ya ku bi piştgirî û têkariya Weqfa Çand û Hunerê Ya Stembolê, Weşanên Yapi Krediyê û Weqfa Vehbi Koç derketî. Editor: Liz Erçevik Amado, Stembol, 2013.

xwebûn

16-22 Adar 2020 / e-mail: **rojname@xwebun.org** / Buha: 4 TL Hejmar: 13

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazışleri Müdürü: İdris Gürmez
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
Yayın Türü: Haftalık Yaygın Süreli

Yönetim Yeri: Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

Ji Hz. Nûh heta Mehmet Tûnç; Cizîr²

Keştiya Alalû

Agît Yazar



Şebçiraxê şebê Kurdistan im
Çi tebîetbeşer û însan im
Lîlahî li-hemd çi alîşan im
Li riya yar li riya san im
Lew di iqlimê sultan xaqan im

Gera min a li nav Cizîrê berdewam e. Bi ku de diçim, ew sewta ku xwediyê wê xwe şanî min nade di guhê min de dizinge. Ez di dilê xwe de ji rêberê xwe dipirsim: berê me li ku derê ye? Di şûna bersivdayînê de, vê helbestê di guhê min de dikurtipistîne:

Sebahul xeyr xana min,
şehî şîrîn zebana min
Tu yî ruh û rewana min
bibit qurban te canê min
Te-alellah çi zatî tu, çi-wî şîrîn sifatî tu
Ne wek qend û nebatî tu, yeqîn ruh û heyatî tu
Heyat û reheta can im, sebahul xeyr ya xanim
Were bînahiya çavan, bibînim bejn û balayê
Sebahul xeyrî mesta min, letîfa can bi desta min
Xumar û meyperesta min, tu yî meqsûd û qesta min...

Ji xwendina vê helbestê ez tê derdixim, berê me li Medresa Sor e; ango em mêvanê Melayê Cizîrî ne. Gava ez dikevim hewşa Medresa Sor, pêla hîbehîba dengekî li ser çavê min dixîne; mîna qoroyeke mezin bi hev re bilorîne û helbestên eşqê bixwîne, aha sewteke wanî bû. Ez wer hest dikim ku yê wê qoroyê jî bi rê ve dibe, Melayê Cizîrî bi xwe ye. Êdî ez jî nizanim ka gelo ez di xewneke kûr de me, yaxud hest li min tîr bûne. Axir ez gera xwe dikudînim û li ber menzelên Medresa Sor digerim. Hin ji wan menzelan, cihê şagirtan in. Paşê ez derbasî xelwetxaneyê dibim; cihê alim lê digihêjin nîrwanayê û giyanê xwe tev li giyanê yezdan dike. Bi rêzdarî ez jî çongên xwe di bin xwe de ditewînim, pelikê çavê xwe berdidim li ser hev û dixwazim bidim li ser riyeke nediyar. Lê rêberê min ji qazîka xwe dikuxwîne, da ku min hişyar bike.

Çaxa ez ji xewletxaneyê derdikevim hewşa medresê, ez û kalemêrek em sîngasîng tên hemberî hev. Lêvên kalemêr, navberê dide xwendina gotinên pîroz û bi dengê mîna pîşo nerm, bi silavdayineke rûken min disilavîne. Ez jî bi hemû dilnizmiya xwe, xwe ji kalemêrê dilpak re ditewînim û derbasî ser tirba Melayê Cizîrî dibim.

Bedena min li hember tirba Melayê Cizîrî, di tertîbata leşkerekî ji fermandarê xwe re rêzgirtî, rawestiyabû. Ne bi zimanê xwe, min bi bedena xwe ji Mela re dia dikir. Tiştekî ecêb bû! Tirba Mela jî ji guhê min re qesîde digot:

Ez gula baxê îremê Bohtan im

Mûcîdê kurd: Îsmaîlê Cizîrî

Ez ji ser tirba Melayê Cizîrî derbasî ser tirba Ebul-Îz El-Cezerî, navê xwe yê din Îsmaîlê Cizîrî dibim. Dengê pêjnekê li pişt min tê. Nizanim pêjna kê ye. Qet ez nafitilim û li pişt xwe jî nanêrim. Çend caran ez li dora tirba El-Cezerî digerim. Pirtûka birêz Abdullah Yaşin a ku li ser vî mûcîdê kurd nivîsandiye di destê min de ye. Ez pelê pirtûkê diqulupînim. Li notên xwe yên li jêra rûpelan dinêrim. Ne carekê, hezaran carî ez ji vî mûcîdê kurd re heyran dimînim. Aqilê meriv hilnagire. Çawa çêdibe ku heysed sal beriya niha, bêyî, batarya, elektirîk û mazotê bi dehan aletên mekanîk çêkirine û ew dane xebitandin. Tenê bi dehfdana bayê, bi herikandina avê û bi hêza keldixanê ew aletên robotîk dane şuxulandin.

Ev mûcîdê kurd ê bi navê Ebul-Îz El-Cezerî, beriya gelek mûcîdên dinyayê yên bi nav û deng wekî Leonardo Da Vîncî, Thomas Edîson û Nîkolay Telsa temelê robot, kompîtir, nifteyên bi şîfre, saetên otomatîk, pompayên avkêş û pêlîstokên zarokan ên jixweber dimeşyan çêkirine. Her yek ji wan jî xêzandiye. Her wiha El-Cezerî di der heqê robot û çêkirina wan alavan de kitib jî nivîsandiye. Wer tê famkirin ku evan mûcîdên navdar ên min ew li jor bi lêv kirine, gelekî sûd ji El-Cezerî wergirtine.

Hêjayî gotinê ye ku hinek ji wan îcadên El-Cezerî hîn jî tên bikaranîn. Yek jê saeta kevirî a bi rojê dixebite ku ev saet li hewşa Mizgefta Mezin a Amedê ye. Ya din jî hewza avê ya li Medresa Qasimiyê ye ku ev hewza bi sêwirandineke çawa zarok dikeve rehma diya xwe, heta ji diya xwe dibe dikeve mahtikê û ji wir jî zarokatiya xwe dijî dibe ciwan û ji ciwantiyê derbasî kalbûnê dibe, merhele bi merhele sêwirandiye û çêkiriye. Hîn jî ew hewza avê wekî roja xwe ya ewil bê qusûr dixebite. Bi heman sêwirandinê, hewzek li kela Herranê jî hatiye çêkirin. Bi îhtîmaleke mezin ev hewza li kela Herranê jî, ji hêla mûcîdê kurd Îsmaîl El-Cezerî, ango Îsmaîlê Cizîrî ve hatiye çêkirin.

Cizîr û mîr

Niha jî berê min li Birca Belek e. Her ku ez nêzîkî qesir û qonaxên Mîrên Cizîra Botan dibim, kelecan li min zêde dibe. Ez çemê Dîcleyê didim çepê xwe û di ber Birca Belek re derbas dibim. Bi qasî qadeke fitbolê, valahiyek di navbera kelê û çem de heye. Pêjnek ji pişt min tê û bi dengekî mîna pîşo nerm di guhê min de dipistpiste: "Ma pêwîst dike ez ji te re bibêjim ev der, rezê Mîran, cihê hevdîtina Mem û Zînê bû!"

Di deriyê Şêr re dikevim hundurê kelê. Li rast û çepê min avahiyên rêveberiyê hene. Ne îşê heneka ye, nêzî pênc sed salî, ji sala 1270'î heta sala 1850 Mîrên Cizîra Botan, welatê xwe li vê derê bi rê ve birine.

Ez di pêpelokên avahiyeke du qat re radipelikim, derdikevin serê banî. Dilê min, nola çoyê defê li sînga min dixîne. Ez nizanim ez li dora xwe dizîvirim, yaxud Cizîr li dora min dizîvire. Cizîr li dora min dibe nola gerînekekê, dibe nola Bîra Qederê a ku Mîr Celadet Elî Bedirxan têwerbûbû!...

Hemû lehengên di destana Mem û Zînê de, yek bi yek di bîra min de vedijîn. Her yekê ji wan li gorî rista xwe li dereke qesir û qonaxê Mîrê Cizîra Botan bi cîh dikim. Mîr Ezdîn, Tajdîn, Heso, Çeko, Sitê, Beko, Mem, Zînê û yên din.

Her wekî tê zanîn piştî 250 salan di ser eşqa Mem û Zînê re derbas dibe, feylozofê kurd Ehmedê Xanî ji Bazîdê tê Cizîrê û dest bi nivîsandina destana Mem û Zînê dike.

Xwe bi xwe ez ji xwe re dibêjim: Ev 330 sal berê feylozofê kurd Ehmedê Xanî jî nola ez a niha çer dikim, ew jî hatibû Cizîrê û wanî li van deran lêkolîn kiriye. Ger ez li xwe mikur werim: ev muqayesekirin, hesteke şîrgermî dadiwerivîne kûrahiya dil û hinavê min. Lê tavilê ez li xwe hay dibim. Mîna min bêrêziyek kiribe, ez li xwe hiltêm û di dilê xwe de ez bi xwe re dixeyidim: De hela here lo, kundur! Tu kî yî, feylozof Ehmedê Xanî kî ye!

Ez bi van hestên tîr û tevlihev li wan deran digerim. Diçim li ber devê deriyê avahiyekê disekinim. Deriyê wê kilîtkirî ye. Ew dengê ji ewila ewil de rêbertiyê ji min re dike, dîsa di guhê min de dikurtepiste: Ev avahî, zindana Mem lê hatibû zindankirin ew zindan bi xwe ye!

Ji min we ye kevirên wan dîwaran tevdek bi birîn in. Loma jî mîna meriv destê xwe bi birîna birîndarekî xedar bike, wanî bi himetî ez wan dîwaran dipelînim. Paşê ez diçim ji gulfiroşekî çar ta qurnefîl distînim û berê xwe didim ser tirba Mem û Zînê.

Mem, Kurdistan Zîn û kurd

Li ber serê tirba Mem û Zînê radiwestim. Bedena min li wir e lê giyanê min li Bazîdê li huzûra feylozofê mezin Ehmedê Xanî ye. Tu çendîn mezin û bilind î Ehmedê Xanî! Ew çi qelem e, ew çi derya ye ku wexta te navê Mem jê dot, welatê me Kurdistan a mêtinger di asoya me de hate neqişandin; ew çi qelem e, ew çi derya ye ku wexta te navê Zînê jê dot, miletê me kurdên bindest di asoya me de hate neqişandin. Tu çendîn mezin î, tu çendîn bilind î, ew qelema te çendîn derya ye, ey seydayê min ê gewre feylozof ê kurd Ehmedê Xanî!

Ez her çar ta qurnefîlan, her yekê li ser navê beşek welatê xwe yê di cenga berxwedana rizgariya xwe de ne, datînim ser tirba Mem û Zînê û xatirê xwe ji wan dixwazim.

Di jiyana mirov de yekcaran tiştên wer diqewimin, meriv gewdeyê xwe ji bîr dike; tenê meriv bi hebûna xwe ya ramanî dikane hebe. Tişta li nav kolanên Cizîrê hatiye serê min jî, ev tişt bi xwe ye: ez tenê bi wê cîhana ku Ehmedê Xanî di asoya min de vejandiye dijîm.

Ez dixwazim biçim wê dera ku Mehmet Tûnç û hevalên xwe bi mehan li ber xwe dabûn bibînim. Hîn jî ew sewta Mehmet Tûnç di mejiyê min de deng vedide. Mem digot: "Heta em Zîna xwe rizgar nekin, jiyan li me heram e! Di oxira Zînê de em werin kuştin jî, em ê çongan netewînin!"

Xwedêyo ev çi edalet e! Dema ev hevok tê bîra min, yekoderb tiştek di pîstika mejiyê min de birq vedide. Bi girgincik ber bi tirba Hz. Nûh ve dimeşim. Du heb kalemêr li ber tirba Hz. Nûh dibînim. Yek ji wan ew kalemêrê li Medresa Sor bû. Dîsa ew lêvên wî mîna lêvên kîvroşkê wexta diçêre, wanî gotinên pîroz di nav devê xwe de dicûtin. Min jî çend gotin di nav devê xwe de cûtin. Lê gotinên min ji diayan wêdetir hesabpirsînek bû, bibîrxistinek bû: Ey Hz. Nûh! Ma qey ew soza yezdan dabû te, wî ew soza xwe ji bîr kiriye? Qaşo ew ê yezdan careke din tofan ranekira û wî yê kesên bêguneh bi yên gunehkar re ceza nekira! Ka, wî yê tenê kesên xurufî, zalim û yên jirêderketî ceza bikira!..

Carcaran ez gewdeyê xwe yê ku li ramana min bûye bar, li kolanên Cizîrê ji bîr dikim. Çaxa pê dihesim, ez li gewdeyê xwe yê jibîrkirî vedigerim û nola sakoyekî pertolpertolî li giyana xwe ya xencerkirî dipêçim.

Êdî wext tê ez ji Cizîrê veqetim. Hatina min jî û veqetandina min jî a vî bajarî, hestên tîr û tevlihev li min rakiribû. Dîsa dengek li ber guhê min dikeve. Nola wî dengê ewilî. Ew dengê ku rêberî ji min re kiribû. Ev sewta dihat guhê min, sewta oxirkirinê bû. Digot: oxir be mamo! Ez dixwazim hîn bibim ka ev deng, dengê kê ye. Difitilim li pişt xwe dinêrim, ez tu kesî nabînim.

Li Cizîrê dengek heye, lê tu kes tune ye. Dengekî 'Bêkes'!